Ji Belavokên Kovara Metîn
Hejmar(( 4 ))

# REWŞEN

Seîd Yûsif





**Diyarî bo giyanê mîra Botan**

**Rewşen Bedirxan**

Ji belavokên kovara Metîn
Hejmar « 4 »

K.D.P

# REWŞEN

**S. Yûsif**

## Helbest - 2 -

INSTITUT KURDE de PARIS
• BIBLIOTHEQUE •

## Çend têbînîyên giring

Em ji xwendewaran û Mîrê tenbûrê lêborîn dixwazîn ku me hinek guhartinên biçûk di rênivîsara dîwana wî de kirîne, ev jî her ji bo baştir bê xwandin û Kurdên bi zarên dî di axivin tê bigehin.

1. Cînavê kesê duwem (tu) bi çar forman hatibû nivîsîn, me du hêlan (T'; Tu), herwesa tu= çu= hîç.

2. "Tu wê" bi formê (tê) hatibû nivîsîn, me kire (T'wê) ji bona rontir û aşkira tir be.

3. (Narê) û (Nanî), me kirin (na'rê) û (n'anî), ew jî bo diyar kirina binekoka wan ku na herê û ne anî ye.

4. Me dest ne da (go) , ku bi pirranî li şûna (ku) hatîye.

5. Pêvîyatîya helbestê hinek kurt kirin fer kirine, ji wan:

J'= ji

M', mi= min

'M= em

'Z= ez

D'= di

L'= li

T'= tu

## Pêşgotin

Demê hêja Diyar Doskî, ji min xwastî, ku ez pêşgotinekê ji dîwana stiranên S. Yûsif re binivîsim, du dilîyê ez girtim, ji alîyekîve ez şad bûm ku navê min di gel helbestên Mîrê tenbûrê bê çapkirin, ji alîyê dîve sam û tirsa wexera cîhaneka nû ez girtim, lê, li dawîyê min pê danî ser tirsê û gote xwe: Lawo herre û netirse, dîwan peyvên ji deng û tenbûrê rût kirîne... Helbestên wî li ser berperan nivistîne, evca hêdî - hêdî min xwe berda nav cîhana Mîrê tenbûrê û her gavek bi hezar rawestiyana min havêt, lê diser hindê ra qirrika min ew bê dengîya min divîya têk dida û digel kak Zekerîya bihevre digot:

*Oy Felek ji boyî çi*
*Te ez hiştim ji hevala*
*'Emrê min çardeye ez*
*Xuya dikim mîna kala*

Û pêra bîranîna kolîcê û guhdarî kirina kasêtên Mîrê tenbûrê vejîneve û digel aşopa min davkêş bûn û gotina biraderekî hate bîra min dema gotî: Erê hûn nabêjine min, em dê ezmûna serê salê bi

Se'îd Yûsif kin yan bi noşdarîyê?

Eha îro jî ez bendewarê hunermendîya Mîrê tenbûrême û demê ez dibînim, ev helbestên lîrîkîyên nazik, her ji dilê wî derketine, S. Yûsif hêj mezintir lê dihêt...

***Derba li min xe***
***Bera 'z birîndarê te bim***
***Min bi êşîn***
***Hema ku ez li cem te bim***
***Ne şerme ez***
***Bimirim ji derdê evînê***
***Min bi kuje***
***Bera'z mirîyê bejna te bim***

Hosa tenbûra melûl û xwejen ji heparê hunermendî vedirije nêv wujdana her kesî, û bi evînek nazik, bi sozek Kurdewarî dinya hemû evîndaran digire û ew sitema li dilên evîndar di hête kirin, dîlanek sofîyane di gerdûnîde peyda dike...

***(Ez wê)***
***Ji bîr nakim bi se'et û gav***
***Di bûrî, li min nakî silav***
***Sê sal ew qas hez kirin***
***Tev hate ji bîr kirin***
***Bi evînê em hatin naskirin***

***Ew evîn çû av û av***

Ev evîna dilên mezine ku dijwartire ji her kesekî û xwe gorî kirineka berdewame di evînê, bi xwede, ku gelek nêzîkî sofîyên rojhelatîye, hindî dilber, evîndarê xwe bi êşîne, evîndar pitir xwe dihavêje deryaya evînê û xwe têde di fetisîne û taku ebed dil dimîne warê wê evînê û kesek dî napejirîne...

***Tu d' nava dil deyî***
***Dil evîndare, dil evîndare***
***Heya go tu heyî***
***Ev dil ji bo te, xweş cî û ware***

Lew evîndar dikeve ber zordarîya dinê, û dilber, gulek geş di dilê pîr û evîndarde dimîne...

û her bi tenê S.Yûsif, di bêje:

Ez pîr kirim ew ma ciwan

Ev pîr bûna leşî û ciwan mana evînê (dilber) pêre digel gotina me ya selal (serî) tê.

S.Yûsif ji alîyek dîve, wekû komeka evîndarîyê, cîhanek romantîk ava dike û dibe ser kêşê evîndaran... Xerîbîya ebedîya wî, evîna paqija ebedîya wî, warek dî li dinyayê di afirîne:

***Xerîbim ez kesî nasnakim***
***Bê hevalim, bê dost û birakim***
***Kesek tune ez li cem rûnim***

*Kes nîne vî dilî pê şakim*

Ev havî bûne ji dinyayê ber bi ava kirina Yotopiya evîndaran (lê digel ji bîr nekirina rastîya jiyana rojhelatî...):

*Bû êvar roj l'me çû ava*
*Lawiko de'm herin malê*
*Ba rabû l'me tê xunave*
*Şêrîna dilê m' delalê*
*Wê bi gerin li me dê û bave*
*Xwestîme j' bo kurê xalê*
*Va ez herim bişyê silava*
*Ne bêje kesî çûme balê*

Herwesa Mîrê tenbûrê alîyê civakî û doza gelê Kurd ji bîr nekirîye.. Newroz pîroz kirîye, pesinên pêşmeregan kirîne û jin û zarokên Kurdan jî bêbar nekirîne, ku tevde panoramayek jiyana meya îro pêk di îne

*Newroz cejna mey mezine*
*Hevalo werin dîlanê*
*Evro cejna gelê mine*
*L' her çar parçên Kurdistanê*

Paşî gazî pêşmergeyan dike:

*Pêşmergene, pêşmergene*
*Hûn şêrgelê gelê xwene*
*Kurdistanê di parêzin*

***Bi cerg û xebat û hêzin***

***Em tev bi qurbanî wene***

Li dawîyê di bêjim xwezîya wê rojê ku, daxwazîya S.Sûsif bi cî hata û Ala rengîn me hildaba jor, hîngê da qedrê qelem û hunera bi sedan yên weka S.Yûsif Bi hata zanîn.

**Dr. Fadilê Emerî**

**Duhok**

# Felek

*Oy, Felek ji boyî çi lê*
*Te ez hiştim ji hevala*
*Emrê min çarde ye ez lê*
*Xuya dikim mîna kala*
*Carek tenê mirada min*
*Wey Felekê te b' cî n'anî*
*Ê'ne ji kul û ji derdan*
*Ev dilê min her dinala*

***

*Oy Felek ji boyî çi te*
*Mirada min te b'cî n'anî*
*Maldarî ji ba min çû lê*
*Feqîrîyê l'cem min danî*
*Van hevala ji bîr kirin*
*Teva pişta xwe dida min*
*Van xwedîya bi carekê*
*Ez firotim bi arzanî*

***

*Oy Felek van kul û derdan*
*Ez pîr kirim li vî warî*
*Ez kêm ketim.ê' bikevê*
*Kes tu cara nayê arî*
*T'ez kirim çîroka devê*
*Van netuwan ey Felekê*
*Divê dunya pir mezin de*
*Ma tu tenê bi min karî*

# *Li hev nayêm*

*E'b' tere l'hev nayêm tu carî*
*T' maçekî nedê min ji lêva*
*Pora tey reş wek şeva tarî*
*Ma ne ezim gurikê şêva*

***

*Piştî te dî tu bi min karî*
*T' ez kirim wek kalê birê ve*
*Keç hebûn bihtir ji hezarî*
*Kê dil revandî ji te pêve*

***

*E' j' te dixeyidim tu zanê*
*Çimkî li cem min tû buhayî*
*Te nadim bi malê cîhanê*
*Wa piçûka b'mire gihayî*
*M' ne xeyidî j' bo ramûsanê*
*Mi j' te di xwest û te nedayî*
*Derewînê bê soz û civan*
*Tu mi d'kujî tu b'mi ve nayî*

***

*Te bixwe çi j' min divê bêje*
*Li ber çavê m' tu bûyî horî*
*J' te dilê min wa keça hêja*
*Rihê minî şerîn bi gorî*
*Bo te ez bûme weke gêja*
*Çimkî ev dil l' min dikî zorî*
*Çîroka min b' tere dikrêje*
*Bê silav jî hê tu dibûrî*

# Ronahî

*Ronahîya van çava ronahî*
*Bo çi dibakim dilber ti nayî*
*Ma ne bi te ez dibînim*
*Ji bo te ez har û dîn im*
*T' ne yara min î nehayî*

***

*Zanê gava ti dûr dikevî*
*'Z dînim heyva çardeh şevî*
*Bo te ez kûr- kûr dinalim*
*Ez evîndarkî bê halim*
*Berê xort bûm vaye kal im*
*Ta sax im ji dil dernakevî*

***

*Xwedê mirad b'cî anîba*
*Û zikek têr ba û yek birçî ba*
*Ti razaba l' ser van zenda*
*Me pars kirba li va' gunda*
*Ez bimeşîya û tu li benda*
*Bere em bê war û cîba*

# *Ez vê xemlê*

*Ez vê xemlê li xwe nakim*
*Ez va çavên reş kil nakim*
*Ta Kursistanê bistînim*
*Heyfê ji dijmin hilînim*
*Nû ezê dilê xwe şakim*

***

*Telyê xwe nakim bi hine*
*Nakim destê xwe bazin e*
*Ta welat azad bibînim*
*Dijmin bi zor jê derînim*
*Nûka dem û dewra min e*

***

*Ez girênadim kemberê*
*Heya go roja min werê*
*Ji roja xwedê ez dame*
*Bo welat ez canfida me*
*Pêşmerge me l' her deverê*

# *Dîl û jar im*

*Ez dîl û jarim*
*Ne dîn û har im*
*T' delalê min î*
*Ez evîndar im*

***

*Dildarê gul î*
*Dermanê dil î*
*Tu xweş bilbil î*
*Û ez gulbehar im*

***

*Şev pir dirêj e*
*Bûm weke gêja*
*Carek tu bêje*
*Bo te şiyar im*

***

*Dê were rayê*
*Bo çi tu nayê*
*Dikevim tayê*
*B' qîr û hewar im*

# *Jina Kurd*

*Jina Kurd im pirr bi deng*
*Mi deng daye li cîhan*
*Bi serbestî dikim ceng*
*Rizgar dikim Kurdistan*

***

*Ez pirr bawer im ji xwe*
*Û nalîna wî di b' hîzim*
*Ez navê welatê xwe*
*L' ser dilê xwe dinvîsim*

***

*Bi hêrz im mîna şêr im*
*Şêr dimînim ez ev jin*
*karim kevir bihêrim*
*Ji min ditirsî dijmin*

***

*Li gel mêr diçim serbest*
*Dad'kevim meydana şer*
*Nema dimînim bindest*
*Dijmin j' welat dikim der*

***

*Bere xelk zanibin baş*
*Ez zanetir im ji wan*
*Tu car namînim li paş*
*Bûme jîr û xwendevan*

# Tu ciwan î

*Tu ciwan î tu ciwan î ciwan î*
*Awir dijwar î ji tîr û kevan î*
*Pir ji te hizdikim*
*Divim te j' bîrbikim*
*Û dilê mi d' bêjî*
*Dilbera m' kanî*

***

*Tu hêjayî tu hêjayî hêjayî*
*Ewrê m' reş û tarî tu dikî sayî*
*Bi te gulîzerê*
*Bihna min tê derê*
*Ez divim tu werê*
*Çi b' kim tu nayî*

***

*Tu delal î tu delal î delal î*
*Carek bizane go ev dil dinalî*
*Te 'z pîr û kal kirim*
*Te j' derda barkirim*
*Te ez talan kirim*
*Ax l' min û l' halî*

# *Ez xezal im*

*Ez xezal im ez xezal im*
*Bi nazî l' mêrga diçêrim*
*Pirr delal im pirr delal im*
*L' kê binêrim dil dihêrim*
*Ciwan b' şewq û şemal im*
*Lê dîsa ji dil dinalim*
*Ji kerbê lawik bê hal im*
*Ne dibêjim ne diwêrim*

***

*Tim şiyar im tim şiyar im*
*Lê xew bi çavê min nabê*
*Nema karim ez nikarim*
*Ma wê halê min çawa bê*
*Ji vî gundî tu car narim*
*Bi evîn im bi hewar im*
*Derd û kula ez dixwarim*
*Her divim dilê mi şabê*

***

*Ez çi bêjim ez çi bêjim*
*Newêrim bikim dengînî*
*Tu d' bê lal im tu d' bê gêj im*
*Kî li dil bikê mizgînî*
*Herdem hêstira dirêj im*
*Evîndar a wî ji mêj im*
*Mi d' go ez dila dibrêjim*
*Wî dil biraşt bi evînî*

# *Bejna te*

*Bejna te zirav e*
*Rîhan a bi av e*
*Işqa te agir e*
*Va ez ketim nav e*

***

*Te d' bînim li tarê*
*Wa gula biharê*
*Hêstir têne xwarê*
*Ta ro diçî ava*

***

*Di xewde dibînim*
*Go te j' xwere tînim*
*Bo te har û dîn im*
*Gewrê ne j' niha ve*

***

*E' l' bendî te mame*
*B' gorî wa çava me*
*T' zanê 'z çawa me*
*Go d' bînim wa çava*

# *Şahê Cejinan*

*Şahê cejna û şahî ye*
*Rêça cengê danî ye*
*Nîşana kurdatî ye*
*Ronî bo rizgarî ye*
*L' ser şopa te dimeşim*
*Agrê te her gurrî ye*
*Newroz me b' te xwe naskir*
*Herkes zanê Kurd kî ye*

***

*Azadî hate welat*
*Roja te tac da serî*
*Roja nû li me hilat*
*Dijmin bi tirs dinerî*
*Ji wan çavê ' tey fere*

*Ber mêvan vebû derî*
*Bijî bijî her bijî*
*Şahê cejn û şahî ye*

***

*Ew navê teyî şêrîn*
*Her kesek dihilînê*
*Ew taca teyî zêrîn*
*Bi azadî bi mînê*
*Bi te em serfiraz in*
*Dijmin her dikê şînê*
*Bo te em canfida ne*
*Şahê cejn û şahî ye*

***

*Bi xebatê kawa hişt*
*Welat tev bibê buhişt*
*Ji hezkirina hesinker*
*Dil bi carek bûne mişt*
*Ev dijminê bê zirav*
*Ji tirsa wî xwe di kuşt*
*Cejna Kurda newroz e*
*Şahê cejn û şahî ye*

# *Derba li mi xe*

*Berba li mixe*
*bere 'z birîndarê te bim*
*Min bi êşîn*
*Heme go ez li cem te bim*
*Ne şerme ez*
*Bimrim ji derdê evînê*
*Min bikuje*
*Bere 'z miriyê bejna te bim*

***

*Kerr û gêj im*
*Ma kî heye bi halê min*
*Ez pir dêşim*
*Te agir berda rihê min*
*Dil û sewdan*
*B' teve mane girêdayî*
*J' kêre bêjim*
*Li ba teye dermanê min*

***

*Besî min e*
*Gu her sibeh l' te binêrim*
*Wek te tune*
*E' l' dinê çiqa bigerim*
*Rê û rêwan*
*Ji ber min hatine girtin*
*Dil b' tere ye*
*Êdî ezê bi kû ve herim*

# *Hinê*

*Lawo nazik im*
*B' xwedê nazdar im*
*Bo te ranazim*
*Herdem şiyar im*
*Tu were rayê*
*L' min were rehmê*
*Ez evîndar im*
*Ne dîn û har im*

***

*Tu carî nakim*
*Xewa va şeva*
*Dil di şewitê*
*Agir pê dikeve*
*Xelkê bîhistî*
*J' te hezdikim ez*
*Bo te ez bûme*
*Çîroka l' ser deva*

***

*Ji te pêve lo*
*L' bîra m' tune ye*

*Dilê min dêşê*
*Derman l' ba te ye*
*Were mi b' xwaze*
*Lawo 'z ya teme*
*Herkes dizanê*
*Dil l' ser te heye*

***

*Delalo carek*
*Were civînê*
*Da tu bi çava*
*Halê m' bibînê*
*Derdê m' giran e*
*Xew b' çavêm nabê*
*Divê mi b' xwazê*
*An bi revînê*

***

*Lê lê lêlê lê*
*Lê lê lêlê lê*
*Gul û gulşang a*
*L' ber dilê minê*
*Terkate nadim*
*Heya mirinê*
*Herkes ser dînê xwe*
*Tu yara minê*

# *Hêvîdar im*

*Ez hêvîdar im*
*Ji te narînê*
*Ez birîndar im*
*Tu m' ne êşînê*
*Ez evîndar im*
*Bo te şêrînê*
*Bi te nikarim*
*Tu mi d' helînê*

***

*Ez pirr dinalim*
*Û dikim gazî*
*Ji vê evînê*
*Ev dil ranazî*
*Tu were ser min*
*Carek bi nazî*
*Ji komê qîza*
*Dil te di xwazî*

***

*Şerme ji bo te*
*T' nayî rayê*
*Bûme êsîr*
*L' vê dunyayê*
*Ramûsanek*
*J ' te di xwazim*
*Dikim û nakim*
*Tu li ber nayê*

# *Kezya bihûne*

*Kezya bi hûne* *di rex mi de rûne*
*Vî dilî şa ke* *j' êşa dibake*
*û birîn vebûne*
*Bûm e har û dîn* *j' van qîzê derwîn*
*Gelek xwînşêrîn* *J' vî dilê paqij*
*j' destê mi çûne*
*Erê z' giran im* *b' soz û civan im*
*J' te re şivan im* *wa xezala min*
*Wek te çê ne bûne*
*M' gemî derbas kir* *m' zerî xilas kir*
*Nûka m' xwe naskir* *ev heval û dost*
*Tev l' rabûne*
*Me navê nalîn* *ey xweş nazelîn*
*Lê me d' vê hêlîn* *b' keskirnê raxin*
*Û b' gul û beybûne*

# *Ji bîr nakim*

*J' bîr nakim b' se'et û gav*
*D' bûrî l' mi nakî silav*
*Sê sal ew qas hezkirin*
*Tev hate ji bîr kirin*
*B' evînê 'm hatin naskirin*
*Ew evîn çû av û av*

***

*Sê sal li gund man cîran*
*Ji işqa m' xwe kir şivan*
*Bo xatrê bêbêrîyê*
*Em rûnin l' ser kanîyê*
*B' çîrokê evîniyê*
*Bistînim çend ramûsan*

***

*B' kû de çûn soz û civan*
*Çima soz bûne arzan*
*Ka şevbiwêrkê biha*
*Tev j' bîr kirin niha*
*Dîn bûm b' mi ve negiha*
*'Z pir kirim ew ma çiwan*

# *Xezala kendala*

*Keç xezala kendala*
*Ez bûm nêçîrvan*
*Mame l' dûv bi sala*
*Bi tîr û kevan*
*L' serê van tehta*
*Dil dima reht e*
*Min xezal ne girt*
*Bûm êsîr, kovan*

***

*Xezala min gelek*
*Ew dûr di bezî*
*Ew nayê girtin*
*Bi ax û xwezî*
*Bimînim şiyar*
*Şevên germ û sar*
*Heye rojek ew*
*L' min bibê mêvan*

***

*Bê sebr û hedanim*
*Û na cê ji bîrê*
*Ma ez nêçîrvan im*
*Diçim nêçîrê*
*Ev demek dirêj*
*Mame kerr û gêj*
*Ji destê min çû*
*Çendî m' xefk vedan*

# *Xerîb im ez*

*Xerîb im ez kesî nas na kim*
*Bê heval im bê dost û birak im*
*Kesek tune ez li cem rûnim*
*Kes nîne vî dilî pê şa kim*

***

*Xerîb im ez li vî welatî*
*Ev çi sal bû b' ser mi de hatî*
*Di barkim ez pirr bi şewatî*
*Dengê m' naçê dengê kes na kim*

***

*Welat nego çima çûyî*
*Kurê te me dayka mi tuyî*
*J' te dûr bûm tu bêtir şêrîn bûyî*
*Ta ez heme ti car te j' bîr na kim*

***

*Welatê m' tu biha û giran î*
*Welatê m' tu bûka cîhan î*
*Felekê min bi vir de anî*
*Ez yê ku xwe ji te dûr na kim*

***

*Di xwazim tu herdem ava bî*
*Tu dayîka xwenda û zana bî*
*Azad im te serî hilda bî*
*J' xebatê re ez xwe kêm na kim*

# *Sêvê*

*Lê lê sêvê sêvê sêvê*
*E' b' xulam a dev û lêvê*
*Ez pirr şa dibim difirim*
*Gava tu tê mi t'axêvê*

***

*Sêva min sêva xelatê*
*Zerya min awir şewatê*
*Her tûyî gula civatê*
*Şeva tarî stêra şêvê*

***

*Tu j' navê xwe şêrîntir î*
*Min weke te nedî zerî*
*Te na bînim dikim girî*
*Şewqa te wek tava hîvê*

***

*Carek te li min pirsî ba*
*Ji evînê dil tijî ba*
*Rih didim te min karîba*
*Wa şerbeta piştî şîvê*

***

*Sêva min ji dara sêva*
*Mi jê hiskir bi darêva*
*Min kes navê ji te pêva*
*Pordirêjê gaz û nîvê*

# *Destê m' berde*

*Destê min berde lawiko*
*Wê me bibînin*
*Gundî û cîran bi carek*
*Li me bi kîn in*

***

*Destê min berde heyran*
*Wê b' kin dengînî*
*Geleka ji wan ne dîtî*
*Ax tu evînî*
*Wexta me d' bînin weke*
*Tu tîra l' wa xînî*
*Ji qehra dîn dibin ew*
*Berê j' xwe dîn in*

***

*Sozek mi da te ji soza*
*xwe venagerim*
*Gava te d' bînim di firim*
*Bê çeng û perim*

*Gava tu bandikê divim*
*Her car ez werim*
*Dinya nedîtî b' gotina*
*Pirr me d'êşînin*

***

*Go min û te bibînin*
*Carek li ba hev*
*Wê rojê li me reş bikin*
*Tarî weke şev*
*Ezê te êxim çavê xwe*
*Û l' te bidim hev*
*Heger me hev dû kir bere*
*Agir b' xwe xînin*

# *Firotina mast*

*Heger hûn Kurd in bi rast*
*Bere jin ne firoşin mast*
***

*Ev keçên wek xezala*
*Mast d' gerînin li mala*
***

*Malek nîne bê zilam*
*Jin tev de bûne xulam*
***

*Jin ji bo karê malê*
*Ne deynê qûtê salê*
***

*Mêr çêbûye ji bo kar*
*Jin jêre xweş bindar*
***

*Ne bi firoşê mast û dew*
*Mêr bikê qebqeb wek kew*
***

*Xem nakê pîrekin pîr*
*Ku bifroşin mast û şîr*
***

*Bê kes û pîrebî bin*
*Zarokên wan sêwî bin*
***

*Ev karê pirr tamsar*
*Bere ji me re nebê kar*
***

*Ne layîqê jina ye*
*Ew kar karê gêncaye*
***

*Bera keç tev bi xwînin*
*Neçin mast bi gerînin*
***

*Ev liştên ha û tiştê dî*
*Merov ji ber dikê fedî*
***

*Keç xemilî wek bûkê*
*Mast d' gerînê li sûkê*
***

*B' çavkî dî l' xwe meyzînin*
*Van adetan hilînin*
***

*Kurd çêbû ye bi başî*
*Ne bimînê li paşî*

# *Hêvî*

*Hêvî Hêvî Hêvî Hêvî*
*Ev sê sal mame li hêvî*
*Pirr ji sêva ez hez dikim*
*Tu bi xwe mîna sêvî*

***

*Çavê min li bejna teye*
*Wek gula l' nav bexçeye*
*Dilkî min tenê heye*
*B' tere dikim bi nêvî*

***

*Min divê ji te nîşan*
*Wa delal a rih û can*
*Mane bê hiş û sewdan*
*Yek car tu min naxêvî*

***

*Çavê m' tim l' te d' gerî*
*E' b' tere nabim serî*
*Ne tu d' kenî ne digrî*
*Ma tu bê dev û lêvî*

# Min dilê xwe

*Min dilê xwe da te*
*Gava mi hij te kir*
*Te 'z firotim arzan*
*Te çû yekî xwe kir*
*Piştî te bê bextê*
*M' evîn l' xwe tobe kir*

***

*Te b' serê m' sûnd dixwar*
*Te d' go b' wî zimanî*
*Kesî dî j' te pêve*
*Şa nabê bi vî canî*
*B' carkî te 'z j' bîr kirim*
*Te mi l' bîra xwe nanî*

***

*Sê çar salê temam*
*Mi b' tere derbas kir*
*Piştî min te mêr kir*

*Nûka min tu nas kir*
*Te m' l' bîra xwe nanî*
*Û pere bi mi' xelas kir*

***

*Keçê te 'z xapandim*
*Û derdê min gelek in*
*Hêvîdar im heval*
*Henekê xwe b' te kin*
*Tu b' kevê bin desta*
*Tu mêr li hev nekin*

# *Xanî*

*Ê' xanî li min vala bû*
*Ew gava yara m' winda bû*
*Keç hemî bi min dikenîn*
*Neyarê min bi min şa bû*

***

*Ti çûyî te b' xwe re dil bir*
*Cana min te 'z hiştim li vir*
*Kanî ew maçê wek şekir*
*Zehrê min j' ber wa ziwa bû*

***

*Ti çûyî te b' tenê hiştim*
*Cana min tev de biriştim*
*Evîna te ez di kuştim*
*Ax ax mala m' xira bû*

***

*Dibakim bi dil şewatî*
*B' tenê mame l' vî welatî*
*Tu çûyî canê t' ne hatî*
*Mejyê min tev de bela bû*

***

*J' ber çav xwe nede alî*
*Dilê min bo te di nalî*
*Keçê t' mi neke vî halî*
*Rindê ma m' wilo di va bû*

***

*Weke dîna diçim û têm*
*Sewdanê min va ma ye kêm*
*Bêjin kanî sebra dilê m'*
*Ew ronîya va çava bû*

***

*Dê were li ba min rûne*
*Li nava gul û beybûna*
*Birînê dil tev vebûne*
*Bayê vê işqê nû rabû*

## *Hatim taxê*

*Ez carekî hatim vê taxê*
*Mi' dî yarê cila di raxê*
*Min kir silav li bejna zirav*
*Dil û sewdan birin wê çaxê*

***

*Ew roja wê ez nas di kirim*
*Wê ez bê çeng û per di kirim*
*Wê ji bîr na kim ta bi mirim*
*Ta 'z bi kevim binê vê axê*

***

*Tim nexweş im li nav livînê*
*Çavê min qet xewê na bînê*
*Yar jî gelek li xwe dişkînê*
*Dilber ji xwe di xwe der naxê*

***

*Pozbilind û gelek bi paye*
*Rehim di dil de qet nema ye*
*Mal nêzîke ew jê xuya ye*
*Carek riya xwe bi mi naxê*

***

*Ez carna l' hember di sekinim*
*Di bêjim ez ji xwe mezin im*
*Ez gelek cara di pesinim*
*Lê divê yek ji me xwe daxê*

***

*Tu bi mi re neke berberî*
*Evîn wilo qet na çê serî*
*Ev paye bûna ha gulperî*
*Rindê kes tiştekî b' ser naxê*

# *Fincana qehwê*

*Min qehwek vexwar*
*Û min falek vekir*
*Falê go hewar*
*Te çi bi xwe kir*
*Gava t' cûyî xerîbîyê*
*Yara te çû yekî xwe kir*
*Min serî hejandî li ber*
*Min bawer kir û mi ne kir*

***

*Ez çûm nav mala*
*Mi pirsa yarê kir*
*M' dî malek vala*
*Pîrê tevnik çê kir*
*Dan yekî kal e*
*Ji dêla nextê kir*
*Ji ap û xala*
*Bi ya dê û bavê kir*

***

*Ez çûm serê gir*
*M' dest kire kêlekê*
*M' barandin hêstir*
*Li ser çav belekê*
*Xwedya zor lê kir*
*J' bo pera pêlekê*
*Wan dest jev qut kir*
*Xayînê Felekê*

# *Yara min*

*Yara min bejin ziravê*
*J' te dikim ez lave lavê*
*Di xwazim bi te re rûnim*
*Ramûsan çiye min navê*

***

*Bi ştexile l' te bihsînim*
*Evîndar im bo te dîn im*
*Xwe d' wan çavê te de d' bînim*
*Li her demê li her gavê*

***

*Min divê tu rûnê l' hember*
*Ji bo bihna min werê der*
*Li ber çavê min here wer*
*Wa ordeka l' nava avê*

***

*Ez hewceyî dîtna teme*
*Di helim wek mûm û şime*
*Malxirabê ez gune me*
*Çima l' min na kî silavê*

# Dotmam

*Li bendî te'z mam û mam*
*Şêrîna min wa dotmam*
*Mi tu xwest û bav ne dam*
*Û ez jêre na bim xulam*

***

*Pir te d' xwestin ji bavê*
*Her te di go mi navê*
*Ez ketim rê wê gavê*
*Baş bû bi te ve giham*

***

*J' riya te der na kevim*
*Te di bim ez na revim*
*J' dil û can ez te divim*
*Te nadim kesî keç'am*

***

*Em ji hev nayên şûştin*
*Em mirov j' hev re pişt in*
*Bo te xwe didim kuştin*
*Ji xeynî te l' min heram*

# *Sozdil*

*Xewka min nayê*
*Sozdilê ciwanê*
*Bi şev û rojê*
*Havîn, zistanê*
*Mi j' te hez kir ye*
*Te j'xwer' di xwazim*
*Dilberê, rindê*
*Memik şemamê*

***

*Tu j' bîra m' na çê*
*Û te ji bîr na kim*
*Û ez ê vî dilî*
*Zeryê b' te şa kim*
*Di nalînim ez*
*J' êşa di bakim*
*Çav l' te d' gerînim*
*Dîtin dermanê*

***

*Di mînim şîyar*
*Şev pirr dirêj in*
*Her dû çavê min*
*Hêstira d' rêjin*
*Ez, te heval in*
*Dostê ji mêj in*
*Dê were rayê*

***

*Destan dirêj ke*
*Wek evîndara*
*De 'm şa bibin lê*
*L' bin sîka dara*
*Wê l' dil behar bê*
*Û dunya bihar e*
*De 'm dila şa kin*
*Û çêkin dîlanê*

# *Zerya min*

*Zerya min bi nav û deng e*
*Rû weke hevrîşmê peng e*
*Rind û can pirr dilovan e*
*Kirasê lê b' sê çar reng e*

***

*Bejna wê wek tayek rîhan*
*Kezyê wê wek fetlê maran*
*Her ku ew ji min tê xuyan*
*Bi min jê hatî û çeleng e*

***

*Min wê dî sewdanê m' firand*
*Dilê min li dûv xwe gerand*
*Evîn di dil de wê çand*
*Ez bûme miryê wê hingê*

***

*Rû weke rojê û bidê der*
*Ronî dikê ew seranser*
*Memik b' hev re dikim şer*
*Kember li wê noqa teng e*

***

*Başe hê ez ne bû me dîn*
*Kezeba min wê kirye xwîn*
*Belê wilo xweşe evîn*
*Dil bi hev re dikin ceng e*

# *Keç bi xwînin*

*Keçan tev bidin xwendin*
*Ta ku ew bibine jin*

***

*Ewê bibin xwendevan*
*Û bibin zane û dilovan*

***

*Wê bibin jîr û şiyar*
*Her xebatê bikin kar*

***

*Bi rastî wê bibin jîr*
*Tev bi bawerî û bîr*

***

*Bi ziman û weke şêr*
*Wê xwe bidin pişta mêr*

***

*Bo çi rûnin ew li mal*
*Bê ziman û kerr û lal*

***

*Welat her divê xwendin*
*Bo em navê wî hildin*

***

*Kur bi tenê ew ne bes*
*Bibin xwendin hemû kes*

***

*Keç û kur û hûr û gir*
*Ma çi j' xwendinê çêtir*

***

*Bibin Dektor û Hozan*
*Bibin şa'ir û rêzan*

***

*Ta ku bibê kebanî*
*Wê her tiştî bi zanî*

***

*Bere tim bi xwînê baş*
*Bo ew ne mînê li paş*

***

*Dibê j' me re kêmanî*
*Keç xwendinê nizanî*

***

*Ew dema çû pirr dirêj*
*Me jin kir bû kêm û gêj*

***

*Bidin pêşî riya xweş*

*Wê nekin pişt perda reş*

***

*Hûn xwendinê bi kin bar*

*Me j' we re got hezar car*

***

*Keç herin dibistan a*

*Gênc hemî tevî wana*

***

*Bo jina Kurd herê pêş*

*J' bo welat bibê şûrkêş*

***

*Ev jinê jîr û zana*

*B' tenê bê xwendin mane*

***

*Welat her divê xwendin*

*Ji keç û xuh û kur û jin*

***

*Li Kurdistana rengîn*

*Kurd bi serbestî bijîn*

***

*Zûtir bê rizgarkirin*

*Kurd bêtir bê naskirin*

# *Li ba min be*

*Li ba min be neçe dûr*
*Dînim gava tu dûrî*
*Birîn bêtir dibê kûr*
*Evîn l' mi dikê zorî*

***

*Tu diçî ji ber çava*
*Ez tu kesî na bînim*
*Heya ro diçê ava*
*Bi şev ji xwe ez dînim*

***

*Em wek gul û beybûn in*
*Hey xwedê bo min hiştî*
*Ger bi hev re di rûnin*
*Nadim bi sed buhiştî*

***

*Raje destê min canê*
*Bo ev dil hew bi nale*
*Em herin Kurdistanê*
*Welatê bav û kala*

# Tu li alîkîyî

*Tu bi xwe li alîkîyî*
*Dunya tev li alîkî ye*
*Tu j' rihê min şêrîntirî*
*Ê te j' min bistînê kî ye?*

***

*Ji xwe bêtir mi hij te kir*
*Min rih û can li ser te kir*
*Te dilê m' parçe parçe kir*
*Her parçekî li cîkî ye*

***

*Rih j' tere dikim gorî*
*Dilbirîn im t' textorî*
*Tu b' xwe wek gula sorî*
*Her pelekî b' zerîkî ye*

***

*Tu ji paya xwe dakeve*
*Bo ev dilê min rakeve*
*Tu çîroka hemû deva*
*Tu weke gulperîkî ye*

# *Ji bîrê na'rê*

*Divim te ji bîr bikim*
*Tu ji bîra min na'rê*
*Divim tu ji dil derê*
*Dilê mi jî nikarê*
*Te dilê min dihişt*
*Te ez hiştin bê pişt*
*Ezê li te bibûrim*
*Lê xem nakê vê carê*

***

*Tu j' ber çavê min diçê*
*Heyv diçin te na bînim*
*Sebra min bê te nayê*
*Tim bi qîr û nalînim*
*Derdê min pir giran e*
*Soz li bate neman e*
*Me b' hev re sozek da bû*
*L' ser soza xwe di mînim*

***

*Were destan bide min*
*De 'm bibin weke berê*
*Ev rih bi gorî te bê*
*Tu ji vê rê vegerê*
*Berê em dost û yarin*
*Evîndarê kevnar in*
*Û navê me bela bibê*
*Zerya mi l' her deverê*

# *Cîranê*

*Ev sibiha te bi xêr*
*Cîranê wa cîranê*
*Were de 'm qehwê vexun*
*Em rûnin li eywanê*
*Derdê min pir giran in*
*Lê tu kes pê nizanê*
*Va ezê j' tere bêjim*
*Bi tembûrê û stiranê*

***

*Ew dema em zaro bûn*
*Bi hev re em dilîstin*
*Me pir ji hev hez dikir*
*Li her cîy di bihîstin*
*Va tu bû çardeh salî*
*Va salê mi jî bîst in*
*Ku bav te bidane min*
*Minê ev rih bi danê*

***

*Wê roja te ne bînim*
*Weke li ser agir im*
*Tu dibê qey ez dîn im*
*Heme ji xwe na mirim*
*Dema tu xuya dikî*
*Ji işqa ez di firim*
*Tu wan destan bide min*
*Zeryê û rindê û ciwanê*

# *Min ban kiryê*

*Min ban kiryê li min fitilî*
*Li ber pê ket bisk û gulî*
*Min xwestya dil jêre bêjim*
*Zimanê min l' hev herbilî*

***

*Ev dil dagirtî gotin e*
*Tu d' bê gewrê hay jê tune*
*Derdê min gelek mezin e*
*Evîna wê ket vî dilî*

***

*Çawa ya dil jêre bêjim*
*Ji ber evîna wê gêj im*
*Bo wê hêstiran di rêjim*
*Carek b' mi re na ştexilî*

***

*Çi bikim ji vê keca ciwan*
*Dilbirîn im tuyî derman*
*Evîn bûye derdê giran*
*Wê danîye ser vî dilî*

***

*Xwezî carkê b' gota bile*
*Wê şa kir bane ev dile*
*Bejin weke şaxa gule*
*Di biharê de xemilî*

# *Bexçekî çêkim*

*Ezê bexçêkî çêkim*
*Tev de nêrgiz û şilêr*
*Û j' te re ava bikim*
*Xanîkî dûrî bajêr*

***

*Bi carek cam û mermer*
*Li ber derge cotek şêr*
*D' nav peryê ni'ama de*
*Tu raze l' ser textê zêr*

***

*De 'm bibin wek mem û zîn*
*D' evînê de du stêr*
*Rû wek heyva l' çardeha*
*Bidê der b' xêr û bêr*

***

*Her dem tu l' ber çava bê*
*Xwe di bînim dînemêr*
*Tu jî wek ciwanîkê*
*Di nava dil de biçêr*

# *Nadim nadim*

*Nadim nadim terkê nadim*
*Zendan li zendê te badim*
*Dilbirîn im bi evîn im*
*Bo çi b' tenê bê mirad im*

***

*Li vî warî l' vî bajarî*
*Her tu bo min dost û yarî*
*Dil xemgîne ne sotîne*
*Wa ronîka şevê tarî*

***

*Dilê m' kule j' derd û kula*
*Evîn ji nû ketye dil e*
*Em di nalin pir bê hal in*
*Bêjim ka dil bêje bile*

***

*Dilê m' cane dilovan e*
*Bo çi derdê min giran e*
*Di vêm şa bim bi te ra bim*
*Bo te mame bê sewdan e*

***

*Bê te çime sewdan nema*
*Aşiqê wan çavên te me*
*Tu soz bide bona xuda*
*Dildara te ez bi xwe me*

# *Dil evîndar e*

*Tu d' nava dil deyî*
*Dil evîndare dil evîndar e*
*Heya go tu heyî*
*Ev dil ji bo te xwes cî û ware*

***

*Tu kanî wî destî*
*Dil bi evîne dil bi evîne*
*Bûm çerm û hestî*
*Miradê b' cî bîne miradê b' cî bîne*

***

*Carekî wer cem min*
*Li ba min rûne li ba min rûne*
*Mejî û sewdanê m'*
*Ji bo te çûne ji bo te çûne*

***

*Lê go kî çi bêjê*
*Destê m' j' te nabê destê m' j' te nabê*
*Lê bejin dirêjê*
*Dunya l' mi rabê dunya l' mi rabê*

# *Rojek ji rojan*

*Rojek ji rojan*
*Te soz b' mi re dan*
*Rojek sersalê*
*L' te bû me mêvan*
*Ev dilê bi evîn*
*Tev de bû birîn*
*M' rojê xweş nedîn*
*Wa keça ciwan*

***

*M' evîn ne dî bû*
*Lê bûm evîndar*
*Xelk tev di razin*
*E' d' mînim şiyar*
*Tu kes nizanî*
*B' êşa vî canî*
*Awir l' mi danî*
*Mame birîndar*
*Ji bo te hewar*
*Sed carî hewar*

***

*Dunya şêrîn bû*
*Bi min hawîr dor*
*Yarek mi çêbû*
*Weke gula sor*
*Gul bi stirî ne*
*Dest dikî xwîne*
*Te b' xwe dil nîne*
*Te dil bir bi zor*
*Te b' xwe dil nîne*
*Te dil bir bi zor*

# *Pêşmerge*

*Pêşmerge şêrê' l' meydanê*
*Li dijmin di kin fermanê*
*Di parêzin Kurdistanê*
*Pêşmergene pêşmerge*

***

*Ew bazên serê çiya ne*
*Yekê wana b' sed mêra ne*
*Bo welat ew canfida ne*
*Pêşmergene pêşmerge*

***

*Bi şev bi roj ew ranazin*
*Di cengê de teyrê baz in*
*Welat serfiraz di xwazin*
*Pêşmergene pêşmerge*

***

*Tên kuştin serî hildayî*
*B' xwîna xwe dikin ronayî*
*Li ber gêncê nû gihayî*
*Pêmergene pêşmerge*

# *Bû êvar*

*Bû êvar ro l' me çû ava*
*Lawiko de 'm herin malê*
*Ba rabû l'me tê xunav e*
*Şêrînê dilê m' delalê*
*Wê bigerin li me dê û bav e*
*Xwestî me j' bo kurê xalê*
*Va ez herim bişyê silava*
*Ne bêje kesî çûme balê*

***

*Bû dereng şev l' me bû tarî*
*Carek dî t' kare m' bibînê*
*Li min û te xunav dibarî*
*Û ax ji derdê vê evînê*
*Bav wê l' mixê bira b' neyarî*
*Wê diya min derda hilînê*
*De z' herim mala xwe b' kubarî*
*Ji te pêve kes mi  nayînê*

***

*Bi tere soz va ezê rabim*
*Bême vir her du heftî ya*
*Ezê b' xwe cîranê xema bim*
*Te derdê vê işqê dîtîye?!*
*J' te pêve j' kesîra nabim*
*Delalê dilê min xeynî te kî ye?!*
*J' tere me divê b' te şabim*
*Te nadim bi koma xwedî ya*

# Cejna te

*Cejna te pîroz*
*Her sal bi xêr û xweşî bê*
*Sala bê newroz*
*Li Kurdistana rengîn bê*

***

*Bi helbest û stiran*
*Li her cîyî seyran*
*Ala me bê hildan*
*Tim bi kêf û şahî bê*

***

*Bi ceng û xebat*
*Azadkin welat*
*Cejna me ku hat*
*Rihê min bi gorî bê*

***

*Em bibin serbest*
*Weke me dixwest*
*Na mînin bindest*
*Riya me tarî bê*

***

*Bibin xebatkar*
*Rêrast û ne xwar*
*Bimînin şiyar*
*Da m'rada me bicî bê*

# *Xanim*

*Xanim xanimê wey xanim*
*J' vî navî pêve nizanim*
*Va ezê bêm te b' xwazim*
*Îşev l' mala we mêvan im*

***

*Em cîran in tu l' hemberî*
*Dilê min bûye du kerî*
*Min tu dîbû roja berî*
*Hêjî bê hiş û sewdan im*

***

*Lê ew bavê te, te nadê*
*Dilê m' ji dev te bernadê*
*Lê emê bighin miradê*
*E' b' xwe ê rojê giran im*

***

*Tu j' min dûrî dimînim dîn*
*Dil bi carek dibê birîn*
*Wek gula av jê bê birrîn*
*Ez bi derdê bê derman im*

***

*Bera ji min nebin nextê*
*Min ne êşînin bê bextê*
*Lêv şekirê sing paytextê*
*Li ber te ez bê ziman im*

# *Ezê bakim*

*Ezê bakim Kurdistan*
*Ezê bêjim Kurdistan*
*Û dengê xwe hildim ji bo*
*Deng herê koma cîhan*

***

*Dengê xwe rakim bilind*
*Bo ez xuya bikim rind*
*Li her bajar û her gund*
*L' her ciyî bibim xuyan*

***

*Kurd hemî bibin leşker*
*Bi xwendin û ceng û şer*
*Roja nû l' me bidê der*
*Û ala d' ser mere sêwan*

***

*L' her ciyê em xuyabin*
*Divê ji xew em rabin*
*B' welatê xwe em şabin*
*Û derkevin ji bin destan*

# *Serî deyne*

*Serî deyne l' ser zenda*
*Te b' çava tîr li min da*
*Takê rîhanê şkest*
*L' ber bejna tey bilind e*

*   *   *

*M' tu dî carek li tarê*
*Û hê tu j' bîra min narê*
*Te dil ber bi yek carê*
*Te tîr li ser û bin da*

*   *   *

*Bi gorî te xemrevîn*
*Canê ev rihê şêrîn*
*Kanî weke te kanîn*
*Şewqa te daye gunda*

*   *   *

*Bê te çi b' kim ji zêra*
*Ew qesr û qûnax pêre*
*Tu heyva l' nav stêra*
*Keç li ber dibin winda*

## Bendê

*Hey Bendê Bendê Bendê*
*Lê lê Bendê*
*Te j' bavê te dixwazim*
*Cara çendê*
*Te nadê û her dimînim*
*Ez li bendê*

* * *

*Ezê l' dûv te bimînim*
*Ji bo te har û dîn im*
*Dimirim go te nebînim*
*Dilberê xweş lewendê*

* * *

*Bo wan çavên kilkirî*
*Çavên min dikin girî*
*Aqil ji serî firî*
*Çelengê b' zend û bendê*

* * *

*Tu ji xuda bitirse*
*Carek li min bi pirse*
*J' evînê bixwîn ders e*
*Reşrîhana li gundê*

* * *

*Tiştek ji me maye kêm e*
*B' xulama wan rûdêm e*
*Em hev bikin l' gundê me*
*Tev de herin govendê*

# Newroz hat

*Dîsa Newroz hat*
*Welat di nalînê*
*Şer e l' ser welat*
*Çol sor e ji xwînê*
*Lê yekîtî karê*
*Ji dijmin bistînê*
*Kurd bi carek rabê*
*Wê jînê bibînê*
*Em ne berdin dijmin*
*Çav nabînê jînê*
*Xwendin û tifing*
*Wê her tîştî bînê*
*Ne em bi dev bêjin*
*Yê dî l' me bihisînê*
*Birîna me kûr e*
*Dermankin birînê*
*Em bi carek rabin*

*Kî karê me b' xînê*
*Welat biparêzin*
*Ji talan û brînê*
*Bera şûna gorran*
*Kurd cengê biçînê*
*Divê em Kurd hemî*
*Jev nekşînin kînê*
*Heya bi nevîyan*
*Rehmê l' me nayînê*

# *Ji van gewran*

*Ji van gewra hez dikim*
*Esmerekê 'z kuştime*
*Bûm êsîrê evînê*
*Tu kes na bêjê çima*

* * *

*J' kê re bêjim vî derdî*
*Dil girtîye na berdî*
*Kê nasdikim l' vî erdî*
*Bo xatirê wê hatime*

* * *

*Dil d'êşê j' evîndarî*
*Kes li vir nayê arî*
*Ji ser rakê vî barî*
*Dilê mi pê d' werime*

* * *

*Ez mame heya niha*
*Kes bi mi ve negiha*
*Awirê esmera ha*
*Wek derbê şûr û rime*

* * *

*Bera te dil bisota*
*Her ez dîn im ji bo te*
*Carekê te bigota*
*Lawiko ez ya teme*

## *Neke gazin*

*Neke gazin neke gazin*
*Lê lê dînê neke gazin*
*Mi j' te pêve kesek navê*
*Wa sorgula dest bi bazin*
*Ev qas şevên dûrî dirêj*
*Çavê m' ji kerba ranazin*
*Dil û aqlê m' her dû çavê m'*
*Rih û canê m' te dixwazin*

* * *

*Tu d' kê gazin çima*
*B' serê xwe ve li ber te me*
*Bi gorî te rihê şêrîn*
*Tu dil neke behra xema*
*Dunya l' serê m' wêran bibê*

*Tu j' mi reyî û ez j' tere me*
*Serî deynim ser wê kabê*
*Li bin dara l' devê çeme*

* * *

*Neke gazim xwe negrîne*
*Ez pê dêşim m' nelomîne*
*Hêstir ji çava dibarin*
*Wek tu tîra li dil xîne*
*Te b' dest kesî ve bernadim*
*Bi kêf raze û serî deyne*
*Kilê wan çavê te ez im*
*Kî karê te j' min bistîne*

# *Hawar*

*Hewar hewar sed car hewar*
*Dost û heval li me bûn neyar*
*Dosta em j' xwe re firotin*
*Wan hevala standin Dînar*
*Wan xwe da ser tayê dijmin*
*Hevsar kirî mîna dewar*
*Dijmin jî her wan êm dikî*
*Bo talî li wan bibê siwar*
*Ji wan were bûne wezîr*
*Rojê j' Kurda dimrin hezar*
*Ji bo Kurda bidin kuştin*
*Xwe j' dijmin re dikin rêdar*
*Wilo j' wan re naçê serî*
*Çile diçê dibê bihar*
*Kurd tucar di wan nabûrê*
*Derba li wandê bê jimar*
*Wê wan bikê weke mişka*
*Lê bê kun û hin bê kiwar*
*Gelek şerme Kurd dirra bê*
*Xwe j' dijmin re dikê bindar*

*Dijmin jîre bi wî zanî*
*Lê jêre sist dikê hevsar*
*Ê j' meletê xwe re nebê*
*B' hinek dîre ew nabê yar*
*Lê sed xwelî l' serê wa bê*
*Wan xwe hişte bê cî û war*
*Rûreş bûn û her mane reş*
*Xwe sarkirin her mane sar*
*Dijmin li ber roja xwe ye*
*De pê l' wankê b' solê gemar*
*Kurd vê ji wan re nahêlê*
*Ew miletê mêr û şiyar*
*Gelek mîna wan kuştine*
*Teba her laşên wan dixwar*
*Kurd tucarî ji bîr nakê*
*Wê bighînê wana zirar*
*Wê wan bi dar ve bihêlê*
*Û her li wan xînê bi dar*
*Ne kuştî û ne raketî*
*Mîna van serxweşê xewar*
*Wek hestîyê devê kûçik*
*Ne derkevê ne herê xwar*
*Ji bo ew jî û hin mîna wan*
*Firotina Kurd nekin kar*

# *Dilê melûl*

*Ev dilê melûl*
*Ev qas derd lê barbûn*
*Bilbil û şalûl*
*Tev li min guhdar bûn*
*Gava xelkê dî ez û gewrê dost*
*Mejyê wan firî tev de dîn û har bûn*

* * *

*Wa çi j' divê*
*Mane 'm evîndar in*
*Ranazin b' şevê*
*Em ê birîndar in*
*Wan j' hev hez dikir*
*Me d' go 'm du 'akarin*
*Dostên yekî j' wa*
*Dido sisê çar bûn*

* * *

*Heft sal b' evînî*
*L' dûv hev em diman*
*Me soz dabû hev*
*J' dil b' dev û ziman*
*Xêrnexwaza ne d' va*
*Me zor birbû ji wan*
*Divê riya han de*
*Em êsîr û jar bûn*

# *Ez jî teba*

*Ez mirî bûm ne ji te be*
*Rihê m' gorî bejna tebe*
*Go tu sax bê ji mi reyî*
*Go tu bimrê ez jî teba*

* * *

*Rindê cara te dibînim*
*Ji bo wilo sax dimînim*
*Tim bi jînê ve dimînim*
*Bo ev dil bi te şa bibe*

* * *

*Ez dînbim yan ez serxweş bim*
*Yan bê halekî nexweş bim*
*Li ber çavê gelka reş bim*
*Her evîna te sebeb e*

* * *

*Bi şev nîne ji mire razan*
*Bi min qet na kevê hedan*
*Dil êsîr e nayê berdan*
*Her dem wê bi te hewce be*

# Tu derwîn î

*Erê tu derwîn î*
*Tu pirr xwe dibînî*
*Dîse tu şêrîn î*
*Min weke te nedî*
*Tu pirr soza didî*
*Tu bicî nayînî*

* * *

*Te 'z hiştim li vade*
*Gewrê ne j' niha de*
*D' nav kul û derda de*
*Ji te ez dipirsim*
*Ez gelek bi tirsim*
*Ne gihim tu mirada*

* * *

*Min gelek hij te kir*
*Min rih li ser te kir*

*Te j' min bawer nekir*
*Tu pirr didî xapa*
*D' evînê de na be*
*Ne wilo ye lêv şekir*

* * *

*Nazik û nazdar î*
*Tu jî evîndar î*
*I' min bike guhdarî*
*Ji bo vê evînê*
*Tu mi ne êşînê*
*B' gorî hezar carî*

# *Dil disekinê*

*Dilê m' bite di sekinê*
*J' ba min neçe rihê minê*
*Sê roja ez te nebînim*
*Ez tême halê mirinê*

* * *

*Bihna min bite tê derê*
*Na xwazim tu j' ba min herê*
*Çavê min tim li te d' gerê*
*Te nadim bi malê dinê*

* * *

*Go tu ji min dûr dikevê*
*Hedan nîne roj û şevê*
*Gerek to dûrbûnê nevê*
*Tu car mi nehêlî b' tenê*

* * *

*Tu j' ber çava winda dibê*
*D' mînim şiyar heya sibê*
*Balgî j' hêstira şil dibê*
*Ez dîn dibim j' bo te jinê*

# *Ya dilê xwe*

*Ya dilê xwe j' mire bêje*
*Te ez kirim dîn û gêj e*
*Ez gerîyam pirr li dinê*
*M' nedî wek te rind û hêja*

* * *

*Rind û hêja noqzirav î*
*Dilê m' ji xeynî te navî*
*Tu tê bîra m' hemû gavî*
*Evîna te dil dibrêje*

* * *

*Dunya ber çavê m' tarî ye*
*Roja mi j' te heskirî ye*
*Sed textor li min civî ye*
*Teva go evîn ji mêj e*

* * *

*Vî barî ji ser mil hilê*
*Reşrîhanê qurnefilê*
*Tu carekî na ştexilê*
*Şermê ji ser rû bavêje*

# *Em heval bûn*

*Ma ne em heval bûn*
*Tu d' ber mire diçî*
*L' mi nakî silavê*
*'M yar û evîndar bûn*
*Te dî ez kêmketim*
*Tu m' nas nakî vê gavê*

* * *

*Me b' hev re soz dabû*
*Sûnda me b' evînê*
*Em her du j' hev re ne*
*Ew tev de winda bû*
*Ma tu l'bîrê tînê*
*Ma keç tev wek tene*

* * *

*Ev evîndar tev de*
*Bi mirin û jînê*
*L' bendî hev dimînin*
*Ne kes kul û derda*
*Di dil de diçînê*
*Ne hev di xapînin*

* * *

*Ne demê derbaskê*
*Tu min ji rê bibê*
*Xwe l' mi nekî xwedî*
*Ne tu hew mi naskê*
*Li ser bextê tebê*
*Weke min tu nedî*

# *Silav da*

*Silav da min dest bi dest*
*Pêre dilê min di xwest*
*Mi go j'tere dil û can*
*Tev ji tere bi qurban*
*Tu l' tevî bûyî serbest*

* * *

*Silav da destê m' hejand*
*Hiş û sewdanê m' firand*
*Wê nego m' ev xort êşand*
*Wê dî çavê min jê şkest*

* * *

*Tu li rihê min serbestî*
*Dil tu bibe bi wî destî*
*Bimrim bibim çerm û hestî*
*Baş wan destan bike darbest*

* * *

*Tu xezala l' berya jêr î*
*Tirsim gava tu l' mi d' nêrî*
*Xweş e ku tu l' dil biçêrî*
*Weke mêrga b' newal û best*

# *Ez şêrîn im*

*Ez şêrîn im bi şêranî*
*M' şêrîn divê*
*Tu car nakim ji kerba wê*
*Xewa şevê*

** * **

*Mi dil dayê b' mive nayê*
*B' xwe nikarim*
*Wê-bixwazim nekin gazin*
*Evîndar im*

** * **

*B' kul û derd im derdê dila*
*Kes nebînê*
*Dil birîye wê kirî ye*
*Behra evînê*

** * **

*Divêm bînim dilbirîn im*
*Keç nezan e*
*Ji min dûr e birîn kûr e*
*Ew derman e*

# Ku mame sax

*Kula di dil de veda şax*
*Te kor kirî li min ocax*
*Tiştê te b' serê min anî*
*Başe l' dinê ku 'z mame sax*

* * *

*Te hişt işqê l' xwe tobe kim*
*Bi wan her dû çavê te kim*
*Dil ji keçan re hew cekim*
*Mi li destan kirîye dax*

* * *

*Mi j' te hiskir hê ez piçûk*
*Bibim zava û tu bibê bûk*
*Singa te bajarê bi sûk*
*Lêvên te gezo û qeymax*

* * *

*Sebra min nayê bi tenê*
*Bêyî te wa şêrînkenê*
*Dest bavêjim wê gerdenê*
*Ji mi re dibê sebr û semax*

# *Em bira ne*

*Bavo em tev bira ne*
*Heyran em tev bira ne*
*Em tev dikin xebatê*
*Dayka me Kurdistan e*
*Armanc jîna welat e*
*Dijmin baş bi vê zane*
*Kurd tev destan bidin hev*
*Kes nikarê bi wane*
*Hemî tevde bibin yek*
*Berê em canfida ne*
*Dijmin zanê bê em Kurd*
*Tev berê j' hev bela ne*
*Wê fermana me rakê*
*Wek gur xwe dadê wane*
*Çep û rast hemî Kurd in*
*Li ser vê riya hane*
*Gotinên we ne yek bin*
*Deng na gihê cîhan e*

*Kurd berê hemî yek bûn*
*Sed tişt heye nîşane*
*Dijmin me j' hev bela kir*
*Barê dijmin giran e*
*Yekîtî tenê karê*
*Kurda bidê xuya ne*
*Wê dijmin zû bi revê*
*Weke tîra kevan e*
*Kurdistan azad bibê*
*Ji destê ne tuwane*
*Ta ku ew rizgar bibê*
*Tê bidin rih û can e*
*Ala rengîn hildin jor*
*Ta ku herê asman e*

# *Kofî Girêda*

*Kofî girêda*
*Hate ji wêde*
*Li ba mi rûnişt*
*'M ketin keyfê de*

* * *

*Sibê û êvara*
*Dikê heware*
*Bav bûye mare*
*Ketîye rê de*

* * *

*Ez dilmezin im*
*Ez wek hesin im*
*Hember d' sekinim*
*Ji îro pîde*

* * *

*Ez lavelavê*
*Nakim ji bavê*
*M' xeynî te navê*
*Dil te tîr lêde*

* * *

*Divê wê bînim*
*Wê ne xapînim*
*Bê jin bi mînim*
*Deh salê zêde*

## *Li min negrin*

*Li min negrin*
*Derdê min gelek giran e*
*Yar xweşik e*
*Piçûk e û gelek nezan e*
*Go 'z nebînim*
*Li ber min mij û moran e*
*Roja bêşim*
*Zanibin keç ne xuyane*

* * *

*Keç piçûk e*
*Ne ketîye darê jine*
*Dil dêşînê*
*Ne xema wê dilê min e*
*B' mi nizanê*
*Ez kirim behrek mezin e*
*Û bîrê nabê*
*Go ez jê bikim gazin e*

* * *

*Bi wê dêşim*
*B' zarokê re ketimê*
*Lê dinêrim*
*Ta çavê min di qerimê*
*Birîndar im*
*Wek tu l' mixê derba rimê*
*Maçek nadê*
*Rih dixwazê û ez didimê*

# *Behra evînê*

*Dil ketî behra evînê*
*Kes nikarê wî derînê*
*Bi şev e' stêra dijmêrim*
*Bo yarê werê civînê*

* * *

*Civan didê dikê derew*
*Dil li balê d' mînê gerew*
*Gumana min j' xwe ma ye ew*
*Ew jî bihtir mi d'êşînê*

* * *

*Wê ez kirim weke dîn e*
*Çav jê pêve kes nabîne*
*Ez çi bêjim feyde nîne*
*Her ez dikim girî û şînê*

* * *

*Ew bi carek j' bîrê narê*
*Hêstir ji çava di barê*
*Dil wek çûkê serê darê*
*Tim li halê xwe dixwînê*

# *Bi dîtinkê*

*Bi dîtinkê mi dil da te*
*Wê dilê min ji xwe bi êşî*
*Mi dehvik li ber te veda*
*Ez di hatim ketmê pêşî*

* * *

*Ev dilê min ma li ba te*
*Wa çîçeka nav civate*
*Evîna te bi şewat e*
*Wa rinda bi gulk û rêşî*

* * *

*Wê sewdan ji serê derê*
*Li bextê te dilê m' werê*
*Ma go tu rajê xencerê*
*Dilê m' bigrê û bi qelêşî*

* * *

*Bo te j' bîrkim ez te nevim*
*Divê ji te dûr bikevim*
*Çiqa ji ber te direvim*
*Dil mi l' pey te dikêşî*

# *Dev ji te*

*Dev ji te bernadim lê*
*Ta ku sax im ez li dinê*
*Ew gula ez avdim lê*
*Nahêlim tu kes biçinê*

* * *

*Li hêvya te dimînim*
*Go bibim kalek mezin*
*Ji te pêve nayînim*
*L' kû heye weke te jin*

* * *

*Gelekî min tu av da*
*Ta ku tu xweş pişkivî*
*Tu giha te nav da*
*Rû bû wek şana hingivî*

* * *

*Hêstir mi d' barandin*
*Di mam şiyar ne raketî*
*M' çavê xwe d' gerandin*
*Go tu ji min dûr diketî*

# *Kezyê te*

*Kezyê te marê reş in*
*Dêmê te sorî geş in*
*Gotnê te gelek xweş in*
*De îşev rabe were civatê*

* * *

*Gotin weke hingiv e*
*Dejna te weke şiv e*
*T' ya miba wek min diva*
*Memkê te bûna sêvê xelatê*

* * *

*Mal û can ser te danî*
*Hêstir tên weke kanî*
*Mirada m' te b' cî n'anî*
*Te mala min lê birye mîratê*

* * *

*Di helim ez kêm dikim*
*Miryê keça xweşik im*
*Ez divêm dil şa bikim*
*Bi te dilberê awir şewatê*

* * *

*Ne te d' vê ne te navê*
*J' te dikim lave lavê*
*De m' zanîba wê gavê*
*Tu bûyî weke heyva sibatê*

# *Bêrîvan*

*Hatim nav bêrîvana*
*Bêrîvan bêrîvan*
*Hatim bikim seyran e*
*Jê bistînim ramûsan*

* * *

*Hatim pêşya bêrîyê*
*Ji bo dîtna zerîyê*
*Bayê fetlê kezîyê*
*Ji mire kirin nîşan*

* * *

*Bera carek bi gota*
*Ev ramûsan ji bo te*
*Bera hew dil bi sota*
*Bi gorî wê dil û can*

* * *

*Çi xweş e bêrîvanî*
*Li çolê û vî zemanî*
*Keç hemî bên xuyanî*
*Yekê dabê te civan*

# *Dîlber rindê*

*Dîlber canê rindê*
*Te hey ji xwe hebê*
*Ji bo kes tu carî*
*Keçê te j' rê nebê*
*Gelac li gundê me hene*
*Tev dijminê min û te ne*
*Û navên miradê me bibê*

* * *

*Çima dikin gazin*
*Em hev du di xwazin*
*Bi şev em ranazin*
*Heta fecara sibê*
*Gelac li...*

* * *

*'M hev bikin wê çikin*
*Em xort û keçik in*
*Lê go em hev bikin*
*Wê li dinê çibê*
*Gelac li ...*

* * *

*Dilberê bedewê*
*B'rîna dil bi kewê*
*Kêfa xelkê newê*
*Bera weke me bê*
*Gelec li...*

# *Teyrê asmana*

*Gelî teyrê l' esman e*
*Ger hûn çûn Kurdistanê*
*Lawkê min şorişvan e*
*We ev kaxez bidanê*

* * *

*Ez dişyênim silava*
*Li hemû kurê bava*
*Yê welat dikin ava*
*L' dijmin dikin fermanê*

* * *

*Silav li wî û hevala*
*L' keç û kurên delal e*
*L' wan çiya l' wan newala*
*Ê b' xwînê tên avdanê*

* * *

*Ez ê piçûk d' lorînim*
*D' çavê wî de dibînim*
*Kurdistanê distînim*
*B' qurbanê Kurdistanê*

* * *

*Bê zarok tev gihane*
*Şêrê ji wan şêrane*
*L' bendî roja xwe mane*
*Bo dakevin meydanê*

# *Çar jin*

*Gelek hene j' me dîn in*
*Ku çar jina ew tînin*

* * *

*Û serî dikin belayê*
*Weke dilê wa nayê*

* * *

*Ê di zewicê du car*
*Dibê bikê sisê çar*

* * *

*Bo xwe pir dikê derd*
*Yek anî ya dî berda*

* * *

*Pîr dibê dil d'êşînê*
*Ji bo çi jina tînê*

* * *

*Tu jê bikê pirsîyar*
*Bo çi te jin kirin çar*

* * *

*Wê bê yek jê ne baş e*
*Ya didûwê pir şaş e*

* * *

*Ya sisîya xopanê*
*Ya çara hinkî zanê*

* * *

*Jin dibin dijminê hev*
*Hero di xeyîdin tev*

* * *

*Divê ew bibê qazî*
*Yek ji wan nabê razî*

* * *

*Zarokê kevnê jar in*
*Zarwê ya nû neyar in*

* * *

*Piçûkê kevnê xwas in*
*Tazî û belegaz in*

* * *

*Ya nû bo wî çav û gav*

*Piçûk bi kinc û pêlav*

* * *

*Ya kevin dibê bê xêr*
*Ya nû timî b' zîv û zêr*

* * *

*Bo çi ev ser êsayî*
*Derda dikî peydayî*

* * *

*Bîne bi dil yek jinê*
*Dilxweş bijî li dinê*

* * *

*Paşî tê bibê poşman*
*Tê li serkê rih û can*

* * *

*Nebe kalek bê dinan*
*Bijî bi şahî ciwan*

## *Ho yeman*

*Hoho yeman ho yeman*
*Mi dî qîzek ji Siryan*
*Du çavê reş nû kildan*
*Kezî wek fetlê maran*
*Di ber xwe re nû berdan*
*Hûr sedefin ew dinan*
*Qirik bi morî û mircan*
*Sing sipî berfa Zozan*
*Dema wê li min nerî*
*Hiştim bê dîn û îman*

* * *

*Mi dî keçek ji Ermen*
*Xwêdan mîna ava den*
*Çi sorboz bû ew gerden*
*Aqil ji rê bir bi ken*
*Destê m' girêda bi ben*

*Dilê min lê xist bi jen*
*Ew zêr û zîv û maden*
*Wek mermer e ew beden*
*Wextê gava li mi meyizand*
*Kirin pepûk û reben*

* * *

*Mi dî qîzek ji Aşûr*
*Pordirêj û gulîhûr*
*Awir tûjin mîna şûr*
*Dil dikê birînê kûr*
*Çi nêzîk û çi ji dûr*
*Noq zirvene sitûr*
*Mi hin sêv kiribûn tûr*
*Yek da min bi çûr û mûr*
*Dema wê li mi meyzand*
*J' bîra min bir wê tembûr*

# Nama Evînê

*Min name bo te rêkir*
*Misk û ember mi pê kir*
*Û b' hêstirê va çava*
*Ez dişyênim silava*
*Berf û baranê lê kir*

* * *

*Ew nama kul û derda*
*Bihn rijandî bi serda*
*Ji bihna gul û miskê*
*Ji xuhdana berbiskê*
*Ew te b' avê de berda*

* * *

*Evîn te l' bîrê n'anî*
*L' min dikî sergiranî*
*Ew evîna wa sala*
*B' te bûye tirş û tale*
*T' agir berda vî can î*

# Ez ê çi b' kim

Ez ê çi b'kim ji malê dinê
Evîndarim dayê li minê
Lawik tê va min di xwazê
Li bextê we min bidinê

* * *

Ji zû ve ez li benda wî me
Ne sax im lê ez ne mirî me
Ger ew nebê gelo 'z kîme
Ew layîqê m' şengejinê

* * *

Evîn li min bû barê giran
Kes nizanê wa xuşk û biran
Go dinya tev bibê wêran
Terkê nadim ta mirinê

* * *

Ez ê çi b' kim ji zêr û pere
Tevde li min kul û keser e
Go mirada me bi çî were
Nû bihna min wêbê der e

# *Serê m' d'êşê*

*Serê min d'êşê*
*Nizanim çima*
*J' derdê evînê*
*Yan j' kul û xema*
*Ji xelkê were*
*Ez dîn û har im*
*Erê ez dîn im*
*Lê dînê te me*

* * *

*Ber xwe na bînim*
*Tim dibê tarî*
*Tu d' kê ronayî*
*Li vî bajarî*
*Tu ji min dûrî*
*Bo te ez d'êşim*
*Bê hiş di mînim*
*Hêstir dibarî*

* * *

*Li cem min rûne*
*kab li ser kabê*
*Tu ji min dûrî*
*J' xwe wiha nabê*
*Ew pora dirêj*
*L' desta b' alînim*
*Di xwazim carek*
*Dil bi te şa bê*

* * *

*Ez dînê te me*
*Tu j' dil dernayê*
*Derdê m' giran e*
*Dikevim tayê*
*Rindê tu j' mire*
*Derd û derman î*
*Mirada m' tuwî*
*Li vê dinyayê*

# Newroza Kurda

*Tu gelek hêjayî*
*T' ronîya çavayî*
*Her sal û vî wextî*
*Bo wî tacî û textî*
*Kurd tev dikin şahî*
*Ew tac l' te pîroz bê*
Newroza Kurda

* * *

*Sersera tu hatî*
*Tu cejna welat î*
*Divê dîlan çê bê*
*Çi cîyê tu lê bê*

*Tu dikî ronayî*
*Ew tac l' te pîroz bê*
*Newroza Kurda*

* * *

*Kawa rêkek çêkir*
*Xebatê dest pê kir*
*Bi te m' serfirz in*
*Welat em di xwazin*
*Ala me hildayî*
*Ew tac l' te pîroz bê*
*Newroza Kurda*

## *Min tu xweyî kirî*

*Min tu xweyî kirî*
*Dînê b' şîr û şekir*
*Min rihê xwe da te*
*Mi l' ber te tobe kir*
*Bû me êsîrê*
*Işq û evîna te*
*Te dil derman nekir*
*Nekir û nekir*

* * *

*Te çi ji min xwest*
*Min ji tere d'anî*
*Te tiştek neda min*
*Heme te d' go kanî*
*Min di go tu malî*

*T' kes û rih û canî...*
*Rih bû mi da te*
*Dil mi j' tere vekir*

* * *

*Ev sal di buwirtin*
*Ji te bi hêvî bûm*
*Çi d' hate serê min*
*Ez bi wê razî bûm*
*Her dem tu dil xweş bû*
*E' b' qîrr û gazî bûm*
*Ma m' tenê evîn dî*
*Hatim mi hij te kir*

* * *

*Ma li bendî te bim*
*Kubar heya kengî*
*Bo te çi bi mi hat*
*Meyzeke l' vî rengî*
*Gava em zaro bûn*
*Mi j' te hezkir hingî*
*Te d' agir de hiştim*
*Can mi çi b' xwe kir*

# *Diyarî*

*Diyarî... diyarî*
*Mi dil j' ter kir diyarî*
*Ev şevê gelek dirêj*
*Tu ji bîra min na'rrî*
*Heger ez te newînim*
*Û birîna ne kewînim*
*Ez ê l' xwe heram bikim*
*Ax û ava vî warî*

* * *

*Diyarî... diyarî*
*Rû sorgula biharî*
*Go tu j' ber çavê m' diçî*

*Dunya tev dibê tarî*
*Heger ez te newînim*
*Û birîna ne...*

* * *

*Diyarî... diyarî*
*Tu rewşa vî bajarî*
*Mi evîn wilo nedî*
*Te dil kir parçe û parî*
*Heger ez te newînim*
*Û birîna ne.....*

* * *

*Diyarî... diyarî*
*Tu kes bi te nikarî*
*Bere tu m' bi' êşînê*
*Ne carek sê car carî*
*Heger ez te newînim*
*Û birîna ne...*

# *Evîn bar e*

*Evîn bar e l' ser vî milî*
*Lê evîna te her tişt e*
*Agir pirr digrê vî dilî*
*Dîse l' cem min wek buhişte*

* * *

*Evîna te bi stirîye*
*Lê ez ê her ser bimeşim*
*Û yar ji te pêve kîye*
*Her dem bi te ez kêfxweş im*

* * *

*Tu were dilê min veke*
*Bê: çi heye û çi tunneye?*
*Ew bûye weke keleke*
*Maye li ser behra teye*

* * *

*Rojê min weke sala ne*
*Dema ez û te ji hev Dûr in*
*Tu li dil dikê talan e*
*Birînê dilê min kûr in*

# *Bêrîvana Mihabad*

*Bêrîvana Mihabadim*
*Bi te dilxweş û azad im*
*Tu ronîya çavê min î*
*Te b' dunyayê tevî nadim*

* * *

*Ka destê xwe carek were*
*Li van gulê sorî zer e*
*Wê kul ji dil werin dere*
*Zenda li zendê te badim*

* * *

*Carek sozê bo min nadî*
*Ti j' boyî min xweş miradî*
*Ez Şêrîn im tu Ferhadî*
*E' jî aşiqê Ferhad im*

* * *

*Tu lawî û çak û giran î*
*Awrê çava li min danî*
*Dilbirîn im tu derman î*
*Bi te çendî ez dilşad im*

# *Gul û beybûn*

*Xwezî ez bûba ne gul*
*Hero .li ser bihna te bane*
*Tu jî bûba ne bilbil*
*Carê te j' boy min xwendibane*

* * *

*Di çilmisim nabim geş*
*Pirr d'êşim dîtin derman e*
*Bila bi mînim nexweş*
*Lê go textorê min ti bane*

* * *

*Gelek cara tu dûrî*
*Lê dimînim b' hêvî û guman e*
*Rih dikim bi gorî*
*Go bi mi re te soz bidane*

* * *

*Bo te ez evîndar im*
*Û ez ketim nava nezan a*
*Ez bi dil nikarim*
*Û derdê min gelek giran e*

* * *

*Dil dev ji te bernadê*
*Em her dû wek hev gihane*
*Tev gehan miradê*
*Lo delal ez û tu mane*

# *Çawa tê herê*

*Çawa tu herê*
*Mi l' vir bihêlê*
*J' kêre girêdim*
*Vê xeml û xêlê*
*B' kêre bikenim*
*Dil ji kêre vekim*
*Û bêjim kê lolo*
*Kî bêjê min lêlê*

* * *

*Çawa t'wê karê*
*Mi b' hêlê û herê*
*Lê nizanim kengî*
*T'wê l' min vegerê*
*Ez j' te hez dikim*
*Bihtir ji berê*
*B' carek dîn bûme*
*Lawiko vê pêlê*

* * *

*Go t' xuya nakê*
*J' xwe ez tunne me*
*Li her demê ez*
*Bi te hewce me*
*Rihê me yek e*
*'Z parçek ji te me*
*Gava tu d'êşê*
*Can didim ji dêlê*

* * *

*Bere 'z wek gulê*
*L' ber bihna te bim*
*Bo tu j' mire bê*
*Û ez ji tere bim*
*Tu mirada minî*
*Go b' te şa nebim*
*T'wê min veşêrê*
*B' desta rakî kêlê*

# *Yabo çi çav*

*Yabo: çi çav li ser te ne*
*Ne wêrim l' te binêrim*
*Te 'z kirim reben e*
*Yanî qaşo ez mêr im*

* * *

*Yabo: Ê go l' te binêrê*
*T'wê l' dilê wî biçêrê*
*J derda xizêmzêrê*
*Hew karim bijmêrim*

* * *

*Yabo: B' çava tu d' meyzînê*
*Tu çokê min dişkînê*
*Dil pirr lê dixînê*
*Berê xwe dighêrim*

* * *

*Yabo: Gava t' xuya nakê*
*Dil wek dîna dibakê*
*Tu carek dil şa nakê*
*Ez wî bite dispêrim*

* * *

*Yabo: J' kula nikam rabim*
*Min divê bi te şabim*
*L' kesî ewle nabim*
*Û ez dil bi te dispêrim*

## *Keçka Fille*

*Wa keçka Fille*
*Ya l' ser singê xaç*
*Bo xatrê Mesîh*
*Bide min yek maç*

* * *

*Roja min tu dî*
*Keçê bi wî xaçî*
*Dikim û nakim*
*Tu j' bîra m' naçî*
*Mi navê te l' ser*
*Dilê xwe kola*
*Were rehmê bike*
*Li min bi yek maçî*

* * *

*Roja min selîb dî*
*Keçê l' ser wê dingê*
*Memik dire'erîn*
*D' hatin mi bi cengê*
*Gava te l' min nerî*
*B' awirê dijwar*
*Weke tu bavêjê*
*Min berê tifingê*

* * *

*Roja yek şemê*
*Tu çûyî dêrê*
*Memik hêkê dilmê*
*Ruwê te ê xêrê*
*Çavê mi l' te ket*
*Mejyê min firî*
*Dilê mi da dû te*
*Wa selîbzêrê*

## *Mi j' tere go*

*Mi j' tere go cara sedî*
*Tu car ji min neke fedî*
*Divêm her gav te bibînim*
*Ez têm tu xwe b' wê ve didî*

* * *

*Ez têr nabim ji dîtinê*
*Wa bihara dilê minê*
*Ez têm gula, wa gulçinê*
*Te navê hilm l' mi bidî*

* * *

*Mi navê te li ser dil kola*
*Dilê te bûye ji pola*
*Te ez kirim dînê çola*
*Yek xeber xweş mi j' te nedî*

* * *

*B' evînê em bûne heval*
*Ji derda dikim nale nal*
*Te 'z helandim ma ev bû hal*
*Tu li min dikî du bendî*

# *Wer em dila*

*Were 'm dila bi hev bidin*
*Çawa tu jî herê werê*
*Her wê çavê te li mi bê*
*Her t'wê li dûv min bi gerê*

* * *

*Divê tu nekî gazina*
*Ev derdê min pirr mezin e*
*Çi tiştê bê serê min e*
*Sebeb tuyî xweş esmerê*

* * *

*Di dil de agir û pêtî*
*Nakim dengî ji fihêlî*
*Berxê tu rewşa welêt î*
*Miryê teme xizêmzêrê*

* * *

*Kesî nedî derdê dila*
*Wek mi j' misilman û file*
*L' ba min rûne û biştexile*
*Wê bihna min bi te derê*

* * *

*Dilê min soz dayê te ye*
*Sewdanê min bi tere ye*
*Heya rojek 'emrê m' heye*
*Dil ji vê rê venagerê*

# *Min serê xwe*

*Min serê xwe rakir*
*Mi dî dîlber di tewîya*
*Memkê wê xuya kir*
*Weke rêka l' nav du çiya*

* * *

*Çavê mi li bejin û balê*
*Aqlê min ma bû li balê*
*Ew kiras erdê di malê*
*Dilê m' gelek pê d'êşî ya*

* * *

*M' nedî bû j' wê carê pêve*
*B' yek dîtinê dil ma pêve*
*B' wî zimanî b' her dû lêva*
*Silav da û şekir rijîya*

* * *

*Me çîrokê dil di gotin*
*Lê her tişt j' xwe nayê gotin*
*Di go dil nayê firotin*
*Dilê m' kesî ne kirîye*

# *Ferhad û Şêrîn*

*Ne Ferhad û Şêrînê*
*Ne Memê Ala û Zînê*
*Zehmet nedîtin wek me*
*Kes vî derdî nebînê*

* * *

*Ne bi roj û ne bi şev*
*Çavê me naçin ser hev*
*Kezeb û dil helyan tev*
*Ax ji derdê evînê*

* * *

*Em ji kê bikim gazin*
*Dermanê dila b' xwazin*
*Ne şerm e em ne razin*
*Ji ber êşa birînê*

* * *

*Em ji xweda b' hêvî ne*
*Mirada me bi cî bîne*
*Me j' vî agrî derîne*
*Xweda tu me dibînê*

# *Nekin gazin*

*Ji dijmin nekin gazin*
*Em heqê xwe bi xwazin*
*Çav neşkînin ji cengê*
*Em Kurd tev teyrê baz in*

* * *

*Em nevîyê Kawa ne*
*Nav û nîşan xuya ne*
*Dayka me Kurdistan e*
*Bi wê em serfiraz in*

* * *

*Ê ku xwîna me d' mijî*
*Hêja ew me di kujî*
*Lê Kurd wê rabê û bijî*
*Birîndar qet ranazin*

* * *

*Ez ê bikujim dijmin*
*Ko kî bikevê ber min*
*Wan di kuşt zarok û jin*
*D' birin gustîl û bazin*

# *Keça dilovan*

*Rûniştim bin dara bîyê*
*Min dî keçek dilovan*
*Mi xwe berda çûm pêşîyê*
*Min jê standîye nîşan*
*Ev dil di xwazê şahîyê*
*Divê em bikin seyran*
*Bi çav im ketim tarîyê*
*Ronî ji te bû xuyan*
*Mi dehv veda l' ser kanîyê*
*Bo te bûme nêçîrvan*
*Dilê min hat û ketîyê*
*Te ez didîm pirr nezan*
*Bûm mîna korê camîyê*
*Bûm lalek î bê ziman*
*Pêl dihatine gemîyê*
*Ji vê behra bê îman*

*Nikam bikim şivantîyê*
*Minê xwe kirba şivan*
*Ji evîna te zerîyê*
*Mame bê hiş û sewdan*
*Sê sal mame l' hêvîyê*
*Hêstir li min bûn arzan*
*Ya dilê xwe min gotîyê*
*Wê dî derdê min giran*
*Go îro li binya çbyê*
*Xorto mi b' tere civan*
*Vena gerrim ji vê rîyê*
*Ez di dim soz û peyman*

# *Porr dibê kom*

*Por ku dibê kom*
*L' ser sera sêwan*
*Go dibê gulî*
*J' xwe nayê pîvan*
*Erê kubarê*
*J' dil nabê çarê*
*Dil tev birîne*
*Tuyî jêre derman*

* * *

*Ça ez girtim*
*Li pey xwe birim*
*Te dilê m' birişt*
*Kubar ez mirim*
*Û hê sebir nayê*
*Bêyî wa her du çavan*

* * *

*Ew dil winda ye*
*Tu rê naçinê*
*L' dor gulê stirî*
*Wê kî biçinê*
*Sê ro ne bînim*
*Tême mirinê*
*Nexweş im bo te*
*Bîne j' mire sêvan*

# *Tu b' hisnê*

*Tu b' hisnê bûyî b' nav û deng*
*Tîre çava ew tên bi ceng*
*Navêje min tîrê şewat*
*Te ez kûştim qîza çeleng*

* * *

*Lêvê te şekir dirêjin*
*Gulyê te gelek dirêj in*
*Mijgul li ser çava gêj in*
*Dêm sor, sipî ev bû du reng*

* * *

*Te nebînim ro l' mi meh in*
*Derdê min ne neh û deh in*
*Çavê tey reş pirr fereh in*
*Bera ji min ew nebin teng*

* * *

*M' tu dî, dîn bûm ji wê rojê de*
*B' şev te d' bînim di xewnê de*
*Mi dil da te xencer lê de*
*Bike rehmê l' mi bû dereng*

# *Min tobekir*

*Min dilê xwe da te*
*Gava mi hij te kir*
*Te 'z firotim arzan*
*Te çû yekî xwe kir*
*Piştî te bê bextê*
*M' evîn l' xwe tobe kir*

* * *

*Te b' serê m' sûnd di xwar*
*Te d' go b' wî ziman î*
*Kesî dî j' te pêve*
*Şa nabê b' vî can î*
*B' carkî te j' bîr kirin*
*Te mi l' bîra xwe n'anî*

* * *

*Keçê te 'z xapandim*
*Û derdê min gelek in*
*Hêvîdar im heval*
*Henekê xwe b' tekin*
*Tu b' kevî bin destan*
*Tu mêr li hev nekin*

* * *

*Ev çend salê temam*
*Mi b' tere derbas kir*
*Piştî min te mêr kir*
*Nûka min tu nas kir*
*Te soz biçî n'anî*
*Te pere b' mi xelas kir*

# *Heyfa çava*

*Heyfa çavê reş belek*
*Ketye destê nezan a*
*Lê çi bêjim ey felek*
*Mêr ne layîqê wan e*

* * *

*sorgul ne ya hova ye*
*Û ne b' qedrê wê zanî*
*Jêve kerbeş xuya ye*
*Sorgul nabê xuyan î*

* * *

*Bi kotek wê dane mêr*
*Digrî sibî û êvarî*
*Xwedya qirik da ber kêr*
*Agir li wan di barî*

* * *

*Yek weke te delalê*
*Yekê zana di xwazî*
*Bo weke bûka salê*
*T' xwedî bikî bi nazî*

# *Qamişlo*

*Qanişlo bajarê evînê*
*Ciyê govenda û civînê*
*Heger tu bi xwe evîndar î*
*Li wê ye dermanê birînê*

* * *

*Keçê wê tev de pirr ciwan in*
*Xortê wê hemû dilovan in*
*Kalê wê tev mêr û giran in*
*Jinê wê wek zêrê l' xizînê*

* * *

*Bi şev tê de kesek ranazê*
*Ji dîloka û govend û sazê*
*Her kesek şahîyê di xwazê*
*Here tê kêfçîya bibînê*

* * *

*Derî di vebê li ber mêvana*
*Û bicî tînin soz û peymana*
*Lawê wê wek şêrê çiyane*
*Her kes welat li bîrê tînê*

# *EV E EV E*

*Ev e ev e ev e*
*Ya 'z wê divêm ev e*
*Ji bîra min naçê*
*Ne b' roj û ne b' şev e*

* * *

*Sed qîzî bidin min*
*Bi wan qayîl na bim*
*Li ber dil şêrîn e*
*Wê nadim bi teva*

* * *

*Gazin mi jê heye*
*L' mi na pirsî carek*
*Çi b' serê min werê*
*L' cem wê weke hev e*

* * *

*Mi dil jêre raxist*
*Bi gul û beybûn e*
*ketye dilê mi de*
*Û ji dil der nakeve*

* * *

*Tê nêzîk bi nazî*
*Divêm wê bigirim*
*Destan dirêj dikim*
*Ew ji min di reve*

* * *

*Di xwazim giran bim*
*Hebkî xwe ragir im*
*Go dûrî min herê*
*Dil pey wê di keve*

# *Civan bide*

*Civan bide û herava dehlê*
*Dûvre ez ê bêm*
*Natirsim ez go te b' revînim*
*Tu mi nebîne kêm*

* * *

*Ji bo te ez karim*
*Xwe b' kim canfide*
*Heskirina te pirr*
*Ketîye dilê mi de*
*Go malê min hebe*
*Minê li te bide*
*Dil bû mi da te*
*Kulîlka devê çêm*

* * *

*Bê mal û mewdan im*
*Bav di xwazê next*
*Divê te bi firoşî*

*Ew bê soz û bext*
*Li dûr meyze nakê*
*Û l' pêşketina wext*
*Zanê tu min divê*
*Û ez pirr te divêm*

* * *

*Ji revandinê pêve*
*Tu rê ne xuya ne*
*Bê pere te nadê*
*Bavê te ne j' wan e*
*Ez ê te b' revînim*
*Û ew tenê derman e*
*Ji bîra min naçê*
*Çav û lêv û dêm*

# *Ox Yayî*

*O...ox ox Yayî*
*Qenc û xweş l' te hat*
*Go t' ketî vî halî*
*Wey lê l' te nema yî*
*De b'la wilo l' te bê*
*Ji êşa tu bi nalî*

* * *

*Bavê te payî*
*J' kesîra nehiştî*
*Wey lê tu nema yî*
*Wî tu ji xwere kuştî*
*Ew pera nas dikê*
*Nizanê tu tiştî*
*Tu jî xwar û marî*
*Tu bê ber û piştî*
*Bera tu maldar bê*
*T'wê çi b' kê j' wê malî*

* * *

*Çend cara bi car*
*Di hatim xwazgînî*

*Ew bavê tey har*
*Dilê mi dişkînî*
*Awir te d' veda*
*Te d' go tu l' mi b' kînî*
*Ew mêrê te kir*
*J' Mirr nabê mizgînî*
*De îdî binale*
*Û bigrî hezar salî*

# *Min Qedehek*

*Min qedehek ji desta vexwar*
*Lê wê ez dîn dikirim du car*
*Çarek bi vexwarna qedehê*
*Û cara dî jî b' awirê dijwar*

* * *

*Heta nîvê şevê pêre rûniştim*
*Xwe kir dilê mi'de bê sewdan hiştim*
*B' gotnê evînî b' carkî ez kuştim*
*Nema di razim her dimînim şiyar*

* * *

*Çi şevek xweş min pêre derbaskir*
*Û çend qedehê meyê b' hevre xilas kir*
*Ez ketim halekî min hew xwe nas kir*
*Mi b' xwe re ji bîr kir bû ferek guhar*

* * *

*Ew rojê wilo xweş gelo ma wê b'ên*
*Tev evîn û şahî û sorgulê bi bên*
*M' nizanî evîndar ecêb pêde tên*
*Ez evîndar im dimînim birîndar*

# *Kurdê nemir*

*Ey Kurdê başî nemir*
*Kal û pîr û keç û kur*
*Em Kurd hene sî milyon*
*Ma kî heye j' me bêtir*
*Carek bînin bîra xwe*
*Va dijmina çi b' me kir*
*Welat kirin çar parçe*
*Her dijminkî parçek bir*
*Bi hezara j' me kuştin*
*J' xeynî ê j' nêza dimir*
*Em tu carî ne d'revîn*
*Me jî ji wan di kuşt pirr*
*Dihatin me ew bi top*
*Bi tankan û balefir*
*Em bi xencer û tifing*
*Me pirr kuştin bi kevir*
*Cara zora me di çû*
*'M di bûn ji berê çêtir*
*Mêranî bo Kurda ye*
*Çi li vir û çi li wir*

*Ji Kurda divê xebat*
*Ne l' dijmin bikin nifir*
*Divê em tev bibin yek*
*Pê l' dijmin kin bikin pir*
*Ji bo jîna Kurdistan*
*Tev bixwînin hûr û gir*
*Ji bo em serfiraz bin*
*Dadin dijmin hûr û gir*

# *Cejna mezin*

*Newroz cejna mey mezin e*
*Hevalo werin dîlanê*
*Ev ro cejna gelê mi ne*
*L' her çar parçê Kurdistanê*

* * *

*Newroz roja nû l' me da der*
*Tu mizgînî bo Kurda yî*
*Ala mey kesk û sor û zer*
*Bila bi mînê hilda yî*

* * *

*Newroz cejna hêja û rind*
*Beremberî sed cejnî ye*
*Bere agir bibe bilind*
*Li nav serê hemû çiya*

* * *

*Newroz cejna azadîyê*
*Rêka cengê dabû xuyan*
*Bibin yek û b' yekîtîyê*
*Zû rizgar dibê Kurdistan*

* * *

*Em Kurd bi ceng û xebat in*
*Hero li ba me newroz e*
*Em canfidayê welat in*
*Jîna welat bo me doz e*

# *Şêrgel*

*Pêşmergene pêşmergen e*
*Hûn şêrgelê gelê me ne*
*Kurdistanê di parêzin*
*Bi ceng û xebat û hêz in*
*Em tev bi qurbana we ne*

* * *

*Em Kurd divin azadîyê*
*Ey piling û şêrê çîyê*
*Welat xwest tu can didîyê*
*Dijmin ne hemberî te ne*

* * *

*Hûn xwîna xwe di rijînin*
*Bo em serfiraz bi mînin*
*Hûn tev şêrê dev bi xwîn in*
*Hêvîya min hûn bi xwe ne*

* * *

*Dijmin dev ji me na gerê*
*Navê j' welatê me herê*
*Lê serşikandî wê derê*
*Bo zanibin em Kurd hene*

# Nazdar

*Nazdara dê û bav im*
*J' te pêve kesî navim*
*Mîna stêrê di çirisim*
*Lê weke ewr û tav im*

* * *

*J' dengê min gul di barin*
*Pirr hene bo min jar in*
*Lê awrê min dijwar in*
*Wek rîhana bi av im*

* * *

*Li ber te bê ziman im*
*B' derdê dilê te zanim*
*J' te b' hêvî û guman im*
*Evîn behr e û li nav im*

* * *

*Tu b' tenê bi min karî*
*E b' gorî hezar çarî*
*Te dil kir parçe û parî*
*Berê 'z hevrîşmê xav im*

# *Çokê min*

*Çokê min qurimîn*
*Ji çûn û hatinê*
*Ji bo te ez hatim*
*Halê vê mirinê*
*Xelkê tev diketine*
*Malê vê dunyayê*
*Ez bi tenê bû me*
*Êsîrê te jinê*

* * *

*Çokê min şikestin*
*Hewar l' vê sikakê*
*Ê go bê arî min*
*Ew kes xuya nakê*
*Dilber ne ji qencî*
*Ne j' xirab deynakê*
*Heme li ber derî*
*B' nazî di sekinê*

* * *

*Bi şev ez ranazim*
*Di mînim rûniştî*
*Yara min dil revand*
*Wê tiştek ne hiştî*
*Evîna wê ma ye*
*J' mire bar û piştî*
*J' b' xwestinê di din*
*Nayê b' revan dinê*

# *Hildin jor*

*Hildin jor hildin jor*
*Ala rengîn hildin jor*
*Xweb' din dor xwe b' din dor*
*Kurd hemî xwe b' din dor*
*Li dijmin bikin ferman*
*De 'm bistînin Kurdistan*
*Yan b' xweşî û yan bi zor*

* * *

*Ber ji me herin şehîd*
*Wek Qazî û şêx Se'îd*
*Bi xweşî nayê geşî*
*Divê birjê xwîna sor*
*Hildin jor....*

* * *

*Millet tev bûne serbest*
*Em tenê mane bin dest*
*Me azadî nema dî*
*Û nema tê sebr û ebor*
*Hildin jor....*

* * *

*Ev dijminê bê zirav*
*Divê em wî bixun xav*
*Bikin xebat bo welat*
*Ta kengî 'm bi mînin kor*
*Hildin jor....*

* * *

*Dijmin bûye kul û derd*
*De 'm pêlê kin bikin erd*
*Divê ceng û nav û deng*
*De em hew bixun tal û şor*
*Hildin jor....*

# *Neke derew*

*Neke derew li min tu carî*
*Xwe nebîne tu bi min karî*
*Barê min gelek giran e*
*Tu ji ser min rake vî barî*

* * *

*Ji boyî te bi şev ranazim*
*Ji xeynî te kesî na xwazim*
*Ez evîndar im belengaz im*
*Hêstirê min bo te dirêjî*

* * *

*Min tu dîtî li xwar û banî*
*Te yek soza xwe bi cî n'anî*
*Te ez di kuştim bi dostanî*
*Lê tu ne dostî tu ne yarî*

* * *

*Derew li ba te hesanî ne*
*Navê tu rastîyê l' ba te nîne*
*M' dil û ceger li ba te danî*
*Derîk d' vebê t' yekî di darî*

# *Ez im şehîd*

*Ez im şehîdê nemir*
*Şêr im diçim şerê gur*
*Divim herdem bikim ceng*
*Dijmin welatê min bir*
*Ger şehîdbim na mirim*
*Go ez bimrim hê çêtir*
*Heger ez bibim şehîd*
*Wek min şehîd bûne pirr*
*Dibim ber û diçim şer*
*Keko destê min bigir*
*Dijmin di revî bi tirs*
*Ne d' zanî xwe bikê kur*
*Di xwazim herim cengê*
*Na xwazim bimrim li vir*
*Erê ez dibim şehîd*
*Bo gelê xwe dibim pir*
*Di ser mi re herin wan*

*Dadin dijmin hûr û gir*
*Li meydanê ez şêr im*
*Na tirsim ji bayê kur*
*Gava ez bibim şehîd*
*Dibim çiya dibim gir*
*B' xwîna xwe dikim ronî*
*Li ber riya keç û kurr*
*Ew dilopê xwîna min*
*Tevde dibê cewahir*
*Dixwazim bibim şehîd*
*Kes ne barînê hêstir*
*Mi nivîsî bijî welat*
*Bi xwîna xwe l' ser kevir*
*Ez im şehîdê bilind*
*Tu kes nîne j' mi mestir*

# *Were b' mêvanî*

*Ma rojekî t' rê şaş nakî dilê min*
*Were carek mala me bi mêvanî*
*Were xwe b' te mezin bibînim dilê m'*
*Were 'z te bibînim tu rih û canî*
*Ne pirr maye ji mire bo te dîn bim*
*Were cem min serîkî bi giranî*
*Derdê m' giran in birînê min kûr in*
*Ez evîndara te me lo tu zanî*
*Heya kengî wê halê min wilo bê*
*Nexweşeka bê hal im tu derman î*
*Li ba min rûne de 'z hilma te bikim*
*Were rûne li eywanê û li banî*
*Cerg û dilê m' te sotin bi evînê*
*Ji dilê xwe di nalim tu bê gumanî*
*Ka ew soz û peymanê te b' mire dan*
*Kurko dîno zozek ne bû xuyanî*
*Bi şev ranazim bi xem û xeyal im*
*Hêstir dibarin weke av û kanî*
*Gula l' ber bihna te me ta ez heme*
*Min navê tey şêrîn li ser dil danî*

# *Kes ne me*

*Kes ne ma mi j' bavê min na xwazî*
*Lê bi kesî hê ne bû me razî*
*Rih û can j' tere dikim diyarî*
*Bi gorî te dibim hezar carî*
*Dil jî didim te bi serfirazî*

* * *

*Divim tu herê û bikrrê kemberê*
*Zêrê zer bera l' bajna min werê*
*Destê min bigre 'm herin seyranê*
*Şake dilê mi rindê û ciwanê*
*Soz bi te re sozê mêrê berê*

* * *

*Ez û tu gulê vî welatî ne*
*Kes nikarê min dûrî te xîne*
*Çi bêjim tu j' berê şêrîntirî*
*Çavê min ji bo te dikin girî*
*Rihê m' tuyî bê çi rih şêrîn e*

# *Sê bira*

*Sê rengê bira hene*
*Herkes zanê bê guman*
*Bira nan û bira can*
*Birayê wî tiştê han*
*Bira nan dibê ji mal*
*De bixwê rojê sê dan*
*Xwe dikê kurê malê*
*Bi sed bavî naghê wan*
*B' kebanîyê re dost e*
*Êdî namînê mêvan*
*Dostê sifra hazir e*
*Her xwarin jêre derman*
*Êrîş dikê xwarinê*
*Tu d' bê l' wê ewe semyan*
*Lê dostanî jê nayê*
*Bira doste bi ziman*
*Rojkî tu kêm bikevê*
*Wê bavê, te bê wijdan*

*heger xwarin nemînê*
*T' wî nabînî bi çavan*
*Yek helbesta min heye*
*Ser birayê tiştê han*
*Ger bi tere bibê dost*
*Ew rojekî ji rojan*
*Wê bibê b' tere bira*
*Te dî çavê wî geran*
*Xwe dighênê jinê l' mal*
*Bi gotin û xeberdan*
*Ger jinek bête nêzîk*
*Kenî wek xuşk û biran*
*Dikevê bawerîkê*
*Wê j' xwer wê bikê nîşan*
*Her roj wê bê b' diyarî*
*L' wê malê bidê serdan*
*Wê rojê hezar carî*
*Xwe j' wa re bikê qurban*
*J' xeyala wî dernayê*
*J' tiştê gelek giran*
*Li wê dibê koledar*
*Ku hebî jinek ciwan*
*Bimrê ew pîsê merdal*
*Lê kevê topa terxan*
*Êdî hevokên hêja*
*Bo birayê dil û can*
*Dema dest ew didê te*
*Tu carî nadî xapan*

*Bo te her canfida ye*
*J' te navê mal û mewdan*
*Her dem bi tere dijî*
*Bi dil bi rih û sewdan*
*Xweyî bîr û bawer e*
*Nayê kirîn bi zêran*
*Ji bo te amade ye*
*Ji dil xwe dikî rêzan*
*Tu bikevê tengîyê*
*Serî d' hildê wek sîpan*
*Her mêrxas û egît e*
*Bi ol bi soz bi peyman*
*Ê wilo bike bira*
*Tu nabînê tu derdan*
*Bila b' tere bira bê*
*Tu car tu nabê poşman*

# Zarokên Kurda

*Em zarokê Kurda ne*
*Ji bo cengê 'm gihane*
*Weke bav û bapîra*
*Bo welat canfida ne*

** * **

*Em mezin bûn em hatin*
*weke bava b' xebat in*
*Canfidayê welat in*
*Em amadene 'm va ne*

** * **

*Keko rahêj tifingê*
*Xuşkê bi nav û dengê*
*M' herin xebat û cengê*
*Li ba me her seyran e*

** * **

*De' m alê bikin hembêz*
*Li bin rawestin bi rêz*
*Bikin xebatek bi hêz*
*Yan Kurdistan yan neman*

# Helebçe

*Ew dilbirîn e helebçe*
*B' girî û şîn e helebçe*
*Tevde bi xwîn e helebçe*
*Li bîrê bîne helebçe*

* * *

*Tu dilî him tu gurçik î*
*Ma wê dijmin bi te çikî*
*T' bûka welatî xweşikî*
*Mirna te l' cîhanê nîne*

* * *

*Ciyê te dilê Kurda ye*
*Herkes bo te canfida ye*
*Me b' te serê xwe hilda ye*
*Bes hêstira bibarîne*

* * *

*Me da ye peyman û soz e*
*Azadîya te her doz e*
*Bîranîna te neyroz e*
*T'wê her serfiraz bimîne*

* * *

*Dost û dijmin herkes zanê*
*Tuwî bûka Kurdistanê*
*Te deng da ye li cîhanê*
*Kes nikarê te b' hejîne*

# *Piçûka ne kujin*

*Piçûka ne kujin*
*Xwînê ne rêjin*
*Ne mêr û ne jin*
*Bera tev bijin*

* * *

*Dara jê nekin*
*Bexçe hişk nekin*
*Reşa kêm nekin*
*Sipî û reş yek in*

* * *

*Wan ne berdin hev*
*Rohê nekin şev*
*Tev bijin wek hev*
*Neçin je v' bi rev*

* * *

*Gul di çilmisin*
*B' agir û hesin*
*Masî d' fetisin*
*Hûn her bê hisin*

* * *

*Di şewitin bax*
*D' herifin qunax*
*Hin dimrin bi dax*
*Hin namînin sax*

* * *

*Gelek tazî ne*
*Gelek birçî ne*
*Kes wa na bîne*
*Kes hay ji wa nîne*

* * *

*Reş nekin bajar*
*Li hev nebin neyar*
*De hişk nebin dar*
*Û tim hebê buhar*

* * *

*Ev dar û devî*
*Gulzar û zevî*
*Çi b' ji tevî*
*G' nebê wek hevî*

# *Adar*

*Ji .bo miletê xebatker bi qehremanî*
*Adara rengîn mizgînîyek mezin anî*
*Pîroz bê xeml û xêla te ey welatê min*
*Ew şînayî, ronayî, û avayîya te danî*
*Di kû de bû xeml û xêla te welatê min*
*Rast e neyaran cila reş li ser didanî*
*Lê me jî ji dijmin kuştin gelek bê jimar*
*Nalîn di ket nav wan ecêb me b' wa de anî*
*Kurd serfiraz e azad e tu car na tewê*
*Dijmin divê Kurd bigrê ew her bi demanî*
*Nizanê Kurd serî na deynê ji dijmin re*
*Di dewrana de kê dî Kurd serê xwe danî*
*Me got û em dibêjin Kurdistan ya neman*
*Kurd welatê xwe ji destê dijmin deranî*

*Li van demê dirêj Kurd her ew erd dikola*
*Bo ava jînê derkevê bo Kurd bibê kanî*
*Dijmin dibakir di got ev milet bê war e*
*Û ferşê mezin bi desta li ser dev didanî*
*Me got Kurdistan ya neman bi soz bi peyman*
*Adar dihat wê mizgînî anî b' giranî*
*Newroz xelata mezin ji Kurd re hilgirt*
*Kurdistan rizgar bû ala hilkişa banî*
*Bijî welatê comerda Kurdistana min*
*Bijî miletê Kurd li her dem û dewranî*
*Ta ku cîhan hebê tu heca me Kurdayî*
*Bijî Kurdistana rengî t' bûka cîhanî*

# *Hovê bajêr*

*Wa Kurdê rindî delal*
*Bira û dost û heval*
*Guneh di stiwê te de*
*Nedîtî keçê nede*
*Kî keça te bi xwazî*
*Divê keç bibê razî*
*Ne b' dilê wê d' bidî mêr*
*Tê bibê hovê bajêr*
*Kulê neke malbatê*
*B' desta nebe mîratê*

* * *

*Bi pirs ji keçê b' rastî ye*
*B' ê wê d' xwazê razî ye*
*Ne bê kesî wer destê m'*
*Mi keç da li ber çî ye*
*Dibê keç ne razî bê*
*Lê nabêjê j' fedî ye*
*Bi zor keçê nede mêr*

*Û nebê ser êşayî ye*
*Wê tev bibê kêmanî*
*J' te pêve sebeb kî ye*

* * *

*Ku tu pera bistînê*
*T'wê zave j' xwere bînê?*
*Neqandin bo keçê ye*
*Ne tu herê b' neqînê*
*Dibê keç ne razî bê*
*Guneh wê kî hilînê*
*Keç ne serbest baxêvê*
*Kur li hember nabînê*
*Ne wilo li hev nakin*
*Wê j' hev hilgirin kînê*

* * *

*Hûn nestînin hezar e*
*Malê vekin ji wa re*
*Ku hev bikin b' dilê hev*
*Wê kêfxweş bin roj û şev*
*Ne mêrek pîr û kal bê*
*Keç nûhatî û delal bê*
*Mêr hinek jê mestir bê*
*Dibê jiyan xweştir bê*
*Wê bibînin jyanek xweş*
*D' mal de wek sorgulê geş*

# Naverok


*Çend têbînîyên giring* 3
*Pêşgotin* 4
*Felek* 9
*Li hev nayêm* 11
*Ronahî* 13
*Ez vê xemlê* 14
*Dîl û jar im* 15
*Jina Kurd* 16
*Tu ciwanî* 18
*Ez xezal im* 19
*Bejna te* 21
*Şahê cejnan* 22
*Derba l' mi xe* 24
*Hinê, hinê* 26
*Hêvîdar im* 28
*Kezya bihûne* 30
*Ji bîr nakim* 31

| | |
|---|---|
| *Xezala kendala* | 32 |
| *Xerîb im ez* | 34 |
| *Sêvê* | 35 |
| *Destê m' berde* | 37 |
| *Firotina mast* | 39 |
| *Hêvî* | 41 |
| *Min dilê xwe* | 42 |
| *Xanî* | 44 |
| *Hatim taxê* | 46 |
| *Fincana qehwê* | 48 |
| *Yara min* | 50 |
| *Dotmam* | 51 |
| *Soz dil* | 52 |
| *Zerya min* | 54 |
| *Keç bi xwînin* | 56 |
| *Li ba mi be* | 59 |
| *Tu li alîkîyî* | 60 |
| *Ji bîrê na'rê* | 61 |
| *Cîranê* | 63 |
| *Min ban kiryê* | 65 |
| *Bexçekî çêkim* | 67 |
| *Nadim nadim* | 68 |
| *Dil evîndar e* | 70 |
| *Rojek ji rojan* | 71 |
| *Pêşmerge* | 73 |

| | |
|---|---|
| *Bû êvar* | 74 |
| *Cejna te* | 76 |
| *Xanim xanim* | 78 |
| *Ezê bakim* | 80 |
| *Serî deyne* | 81 |
| *Bendê* | 82 |
| *Newroz hat* | 84 |
| *Ji van gewra* | 86 |
| *Neke gazin* | 88 |
| *Hewar* | 90 |
| *Dilê melûl* | 92 |
| *Ez jî teba* | 94 |
| *Tu derwînî* | 95 |
| *Dil di sekinê* | 97 |
| *Ya dilê xwe* | 98 |
| *Em heval bûn* | 99 |
| *Silav da* | 101 |
| *Ez şêrîn im* | 102 |
| *Ku mame sax* | 103 |
| *Em bira ne* | 104 |
| *Kofî girêda* | 106 |
| *Li min negrin* | 108 |
| *Behra evînê* | 110 |
| *Bi dîtinkê* | 111 |
| *Dev ji te* | 112 |

| | |
|---|---|
| *Kezyê te* | 113 |
| *Bêrîvan* | 115 |
| *Dilber rindê* | 116 |
| *Teyrê asmana* | 118 |
| *Çar jin* | 120 |
| *Ho yeman* | 123 |
| *Nama evînê* | 125 |
| *Ezê çi b' kim* | 126 |
| *Serê min dêşê* | 127 |
| *Newroza Kurda* | 129 |
| *Min tu xweyî kirî* | 131 |
| *Diyarî diyarî* | 133 |
| *Evîn bar e* | 135 |
| *Bêrîvana mehabad* | 136 |
| *Gul û beybûn* | 137 |
| *Çawa t'wê herê* | 139 |
| *Yabo çi çav* | 141 |
| *Keçka fille* | 143 |
| *Mi j' tere go* | 145 |
| *Were m' dila* | 146 |
| *Min serê xwe* | 148 |
| *Ferhad û şêrîn* | 149 |
| *Nekin gazin* | 150 |
| *Keça dilovan* | 151 |
| *Por dibê kom* | 153 |

| | |
|---|---|
| *Tu b' hisnê* | 155 |
| *Min tobe kir* | 156 |
| *Heyfa çava* | 158 |
| *Qamişlo* | 159 |
| *Ev e ev e* | 160 |
| *Civan bide* | 162 |
| *Ox ox yayî* | 164 |
| *Min qedehek* | 166 |
| *Kurdê nemir* | 167 |
| *Cejna mezin* | 169 |
| *Şêrgel* | 171 |
| *Nazdar* | 172 |
| *Çokê min* | 173 |
| *Hildin jor* | 175 |
| *Neke derew* | 177 |
| *Ez im şehîd* | 178 |
| *Were b' mêvanî* | 180 |
| *Kes ne ma* | 181 |
| *Sê bira* | 182 |
| *Zarokên Kurda* | 185 |
| *Helebçe* | 186 |
| *Piçûka ne kujin* | 188 |
| *Adar* | 190 |
| *Hovê bakêr* | 192 |

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE



Çapxana Xebat - Duhok